

Serdane - 1 -

* Tevgera kurd di Dema Nuh û Neha De

Ermeniya

Akadimiya Zanistiya Yekitiya Soviyete û Akadimiya Zanistiya (Ermeniya) Soviyete
Mosko sala 1987 de
Civata Serpereştiya derxistinê :
M. A. Hesretyan (Serpereştiye Berpirsiyar)
M. C. Lazerêv
S. X. Mugoyan.
Çapxana (Neûka) a Beşe Bingehe Wêjeya Rojhilatê

W E R G E R S O R D

B E R L I N , di 30. 12. 1987 de

P E Ş G O T I N .

Serdane

* Kurd Yek ji kevintirîn Miletên Rojhila nêzik û navînî ye. Kurdan şopên pir diyar di mêjûwa heremê de dane hiştin, her wehaji perezî bigir ew di tevaya bûyînên derbasbûyî de beşdar bûne ji ber hebûna Ferhanga wanî bi serê xwe Kurd bi rengekî mezin ji bona dewlemendbûna pêşveçûna Remanê di navbera Gelên Turkî, Iranî û Welatên Ereban de beşdar bûye. *her wehaji ew ber yekkirina Hêzên kurd di xebata wanî dadî rizgarkirinê de bidin kaşmê kirin.*

ji xwe re daye wergirtin

Di Dema meyî neha de - li gora serjimarê bigir - di Rojhilata nêzik de bigir 20. Milyon Kurd dijîn. Ji Wan:

- 10. Milyon li Turkiyê,
- 6. Milyon li Iranê,
- 3. Milyon li Iraqê,
- 1. Milyon li Suriyê.

Têlê kîr

* Pirsiyariya Kurd ne bes tenê li ser rewş û zîneta Dewletên Rojhilata nêzik û navîn de kêr dike lêbelê ji her wehaji li ser pêwendiyên di navbera wan Dewletan bi xwe de jî dide kêr kirin, perezî li ser politika Dewletên Rojava jî di vê heremê de dide kêr kirin, her wehaji ew ber yekkirina Hêzên kurd di xebata wanî dadî rizgarkirinê de bidin kaşmê kirin.

her wehaji ew ber yekkirina Hêzên kurd

* Mêjûwa Kurdîyî kevin û her wehaji ya di sedsalên navîn de jî bi rengekî pir kêr lê hatiye gerandin, evaya jî bi xwe jî bi pilegekî berz li ser lêgerandina mêjûwa kurd di demên tîn de dide kêr kirin. Lêbelê di Dema meyî neha de Lêgerandineke pir bi pêt ji bona rengên taybetî û ên giştî ji pêşveçûna pêwendiyên Civakî-Abûrî li Kurdistanê divê lê bêtin gerandin.

* Mêjûwa Kurdîya dema nuh û a neha bi rengekî baştir lê hatiye gerandin. Jimarên pir Lêgerandinan li ser mêjûwa Kurd a dema nuh û a neha li nik me, li Yekitiya Sovyete, her wehaji li derve hatine çapkirin. Lêbelê beşekî mezin ji karên dawî, tevî lênerîna wanî yekalî li ser mêjûwa Miletê Kurd, her wehaji perezî encamkirina zanistiyeke rast li ser pêkhatina Civakî-politikî, Rehî li Kurdistan ne hatiye wergirtin, her wehaji ew Lêgerandinên hanê jî bi destkariyên geure ji bona rastî yê û bûyînên mêjûyî bi diyarî têtin nîşankirin, ev tiştên hanê ji politika mîrîyî van Dewletên heremê, a nayînkirina hebûna serbixweyî milîyî Kurd û pêwistiya pêrûniştinê bi mafeyê wanî milî nayîn dike, tete berkirin.

D

M M

sa wa

Hin ji karên Nivîskarên Ewropa Rojava li ser mêjûwa ^{dema} nuh û nemaze ^{sa} neha de bêtir hatine rawestandin, tev livêji ew li gel daxwazên zanistiya mêjûyî nuh nayêtin lihevkerin, tevî ku ew bi rengekî bazirganî hatine danîn, her û her ew piştgiirtina rawestandina ^{devletên} Rojava li Rojhilata nêzik û navîn dikin. ^{ên weke diyare} Pir destanên gewre bi ser serê ^{gelê} Kurd de dane anîn.

D

W
Se

Weha Lêgerandinên mêjûwa ^{dema} nuh û nehayî ^{gelê} Kurd hêjî beramberî pir kelemên mezin dibin, ku ew divên ji ber bêtin hilanîn. Ji ber vê yekê pêşkeşkirina Lêgerandineke giştîyî lihevhatî di mêjûwa ^{dema} nuh û a neha de ^{sa} ^{gelê} Kurd daxwazeke ji daxwazên pêwistî ^{sa} ^{dema} nuh bi xwe ye.

ser

ser

Ev Lêgerandina zanistî-^{sa} berê xebata bihev re ji Karnasên di berê Kurdî de, ên di Destgeha Rojhilat de kardikin, ^{sa} bi Akadimiya Zanistiya Yekitiya Komarên Sosyalistiyî Sovyêtî de (Y.K.S.S.) û Destgeha Rojhilat ^{sa} Akadimiya Zanistiya Komara Ermeniya Sosyalistiyî Sovyêtî de, hiç gûmerekê li ser nerxbûna zanistî û politikî ji vê nameya zanistî re nahêle, û ne lihevhatineke, ku karekî bi vî rengî cara pêşî ye, ji bal Karnasên Sovyêtî de di warê Kurdan de tête afirandin. Li yekitiya Sovyêtê pir cih hene, ku di warê Kurd de guhpêdidin û di warê mêjû, wêje, zanistiya zimên û zanistiya rehê de ^{sa} ^{gelê} kurd kardikin. Karnasên Sovyêtî di warên Kurdî de bi beşdarbûneke hêja di lêgerandinên mêjûyîyî Kurdan de beşdarbûne, eger ne ji kar û barên wanî bi nerx ba, ev karê di nav destên me de ye, dê meyê nîkarîba bida danîn.

Ermeniya
Zan

Koma Nivîsvanan ji bona vê nivîstokê tevaya aliyê mêjûyî ^{sa} ^{dema} Lêgerandinê li ber xwe ne danîn, ji ber firehbûna vê Lêgerandinê re ^{pe} ^{ne} ^{da} ^{ner} ^{wehaja} ^{nade} ^{ser} ^{ne} ^{çûye} ^{ser} ^{li} ^{bende} ^{Gerandinên} ^{tên} ^{gavdêriyê} ^{din} ^{bin}

dage

Danîvnanan bi xurtî li ser yak deqeke mêjûyî dane girêdan, bi rastî jî ew bi xwe ^{giringtirin} ^{aliyê} ^{te} ^{belê} ^{hêjî} ^{bêtir} ^{ew} ^{her} ^{tiştî} ^{diyar} ^{dike}.

Ev Lêgerandina hanê ^{şeweyê} ^{giştîya} ^{Tevgera} ^{kurd} ^{dide} ^{diyarkirin}, ew ^{Tevgera} ^{Kurd}, a ku car caran jî Rûniştvanên Kurd li Ermenya Rojava, di wan Welayetan de, mîna Sîwasê, Erzeromê, Wanê, Bedlîsê, hd, beşek jê bûn. Aramanca vê Lêgerandinê ^{gilobûna} ^{pêkhatin} û ^{pêşveçûna} ^{xebat} ^{Kurd} ji bona azadiyê û mafeyên demokrasî, her wehaji qonaxên pêkhatina ^{xebata} ^{welatîyî} ^{rizgarkirinê}, ^{êdyolocîya} ^{tevgerê} û ^{berên} ^{wêyî} ^{politikî}, ^{pêrabûnên} ^{sazmendî} û ^{partiyên} ^{politikî}, ^{guhertina} ^{pewendiyên} ^{hêzên} ^{Civakî} ^{şên} ^{çînitî} ^{di} ^{nava} ^{Civaka} ^{Kurd} ^{de}, her wehaji wênekirina vê li ser ^{xebatê} ^{ji} ^{bona} ^{mafeyê} ^{Milî} ^{Demokrasî} ^{bide} ^{rûnkin}. Ev karê hanê ^{alîkariya} ^{mero} ^{dike}, ku ^{nêrînekê} ^{li} ^{ser} ^{xebata} ^{qehrmanîyî} ^{gelê} ^{Kurd} ^{li} ^{dijî} ^{Serdariya} ^{Bêgane} ^{ji} ^{bona} ^{Serxwebûna} ^{Milî} ^û ^{rizgarkirinê}, ^{sa} ^{hêjî} ^{nehatiye} ^{rawestandin}, ^{bide} ^{pêkanîn}.

Nivîsvan tevaya aliyên ^{xebata} ^{azadiya} ^{kurd} ^{pêrûdinin}, ku ew ji hemû aliyên ne mîna hev hatiye derxistin. Lê ew ^{hêvîdarin}, ku bi vî rengê hanê jî dê ev Lêgerandina hanê ^{bi} ^{alîkar} ^{be}, ku dê ^{yekekê} ^{ji} ^{kêmaniyên} ^{zanistiya} ^{Sovyêtî} ^{de} ^{di} ^{warên} ^{Kurdî} ^{de} ^{bide} ^{hilanîn}, her wehaji dê ev karê han mîna bingehê xurt ji bona Lêgerandinên din di tevaya mêjûwa Kurd de bête danîn.

betê
bi alî-
bandin

sa wa

Di koma vî karê han de (^{Tevgera} ^{Kurd} ^{di} ^{dema} ^{nuh} ^û ^{neha} ^{de}) tête Beşdarbûn:

- M. A. Hesretyan (Beşê Kurdê Turkiyê IV / VIII)
- C. C. Celîlî (Beşê I)
- O. I. Cigalîna (Beşê Kurdê Iranê IV / VIII)
- M. C. Lazerêv (Beşê II / III)
- S. X. Migoyan (Beşê Kurdê Iraqê IV / VIII)

Danevanê Navnîşnan A. G. Bagirov
 Danevanê Navnivîstokan L. A. Acovêva

D E R I Y Ê Y E K E M
P E R Ç Ê Y E K E M

Raperînên Kurdan Di Pêşiya Sedsalên Nozdehan De

Di destpêkirina sedsalên nozdehan de Kurdistan têbigota belkî ew du carî hatiye perçekirin, ji (aliyê derve de) - di navbera Imperatoriya Osmanî û Şahî Şahiya Iranî de, ên ji aliyên xwe de ber bi herifandinê de dihatin kişandin û hêdî hêdî ber bi jêrdestiya Abûrî, Leşkerî û Siyaseta Dewletên Rojavayî û Rusya ve dihatin ketin. Ji (aliyê hundurê ve) - ew di navbera Mîrneşînen Derebegiyê de parvekirî bû, ên di pêla sedsalên navîn de hatin derketin û di nava wan de mîna (Baban, Soran, Bahdînan, Botan, Hekarê û Mîrneşînen din) hatin xuyanîkirin. Di navbera wan de her û her Ceng û Şer bû, ji ber vê yekê jî sînorên di navbera wan de her û her di firehbûn û tengbûnê de bûn. Tevî ku Baban, Soran û Behdînan ji Paşatiya Bexdadê jî dihatin jimartin, lêbelê di rastiya rastî de pêwendiyên wan li gel Patîşahiya Bexdadê pir qels bû, ji ber Mîrneşînen Kurdan bes û bi tenha di demên Ceng û Şer de ji Paşa re hin Komên Leşker pêşkeşdikirin, her wehaji di navbera demekê û demekê de jibîrnedikirin, ku diyariyên bi nêrx jêre bidin rêkirin, û beramberî van jî ji Berpirsiyarên Kurd bês û bacên Dewletê ne dihatin sitandin. Zemindariyên Derebegiyên pir di nava Xakê Rojhilatî Enebolê de dihatin dirêjkirin, Serdariya Derebege di nava wan de bi serê xwe bû, her wehaji geurebûna bac û bêşan, rengê danîna wan, rêya civandina wan û ên din li gora kêfa Derebege bû. Ji dawîya sedsalên hîjdehan de Mîrneşîniya Baban, ji ber geurebûna girîngbûna cihê erdê wêyî sitiraticî mîna girêka pêwendiyê di navbera Patîşahiya Bexdadê û Iranê de destpêkir, ku ew rolekê jêhatî di jîna siyasiyî Patîşahiya Bexdadê de bide listin, di destpêkirina sedsalên nozdehan de Bajarê Sulêmaniyê navîna Mîrneşîniya Baban bû, ku têde di sala 1812 de nêzîka 4.hezar Kes hebû û piştî Heşt salan 10.hezar kes têde dijyan Di dawîya sedsalên hîjdehan de Serdariya Baban li ser encamê pevçûnên hundurê bi rengekî mezin pir qels bû, vê destdirêjiyên Wênerên Serdariya Şahî û ên Sultan di kar û barên hundurêyî Mîrneşînyê de pir da hêskandin.

Di sala 1803 de Ebdul-Rehman Paşa bû Mirê Baban. Ew bi gavên karî ji bona xurtkirina Serdariya xwe û firehkirina erdên Mîrneşîniya xwe rabû. Tevî gavên dij ji bal Patîşahê Bexdadê jî Ebdul-Rehman Paşa di demeke kurt de rewşa xweyî hundurê karîbû bide xurtkirin û ew li Hevalbend û Parêzvanên derve ji navbera Mîrneşînen Kurd yên Hemsê û Sînordas, her wehaji li nik Wênerên Şah li Kermansah dest bi gerê bike. Pir bi jîrbûn û hostayî wî nobûna pêwendiyên di navbera Imperatoriya Osmanî û Iranê de bikeranî û di sala 1806 de tev li Leşkerê Serdarê Kermansah (Muhemed Alî Mîrze) bû, ê beramberî Fermendarê Bexda Alî Paşa rabû. Qonaxa hatî ji Serdariya Ebdul-Rehman Paşa bi Şer û Cengên li dûhev li ser kenarên Mîrneşîniya wî de di navbera hêzên Fermendarê Bexdadê û ên Wênerê Şah de tete nîşankirin.

Di sala 1810 de bûyînen li Paşatiya Bexdadê li kara Mirê Kurd hatin listin, gava Serdarê dawiyî Paşatiyê -Kutşûk Sulêman-mebesta cihêbûnê da derxistin, ku ev bû hoyê rakirina (Fermanê) li ser, weha Ebdul-Rehman Paşa kês ji xwe re wergirt û bi 20.hezar Şervan hêzên- Kutşûk Sulêman- tar û mar kir û ew da avêtin.

Di salên tèn (tanî 1813 de) tevî li no bûnên pevçûnan di navbera Mirê Kurd de û Serdarê nuhî Iraqê de Ebdula Paşa ji aliyekî de û di navbera wî de û Wênerê Kermansah ji aliyê din de, vî Serdarê Kurd bi jîrbûn û jêhatiya xwe ve dikarîbû sînorê Mîrneşîniya Babanî bi rengekî pir mezin bide firehkirin û serdariya xwe bide xurtkirin.

Di piştî mirîna Ebdul-Rehman de di sala 1813 de lawê wîyî mazin Mehmûd Paşa bû Mîrê Baban, lêbelê wî nikarîbû liber Mîrneşîniyî ji destdirêjkariya nava wêyî xweser ji bal îran û Bexdadê bide, her wehaji pêrejî salên serdariya Mehmûd Paşa di pêla jêhatbûna karên Koloniya Ingilistanê de li Iraq û îranê de bû.

Di navîna sedsalên nozdehan de Mîrneşîniya Baban hate rûxandin û bi carekê ew hate nabûd kirin. Wisajî Mîrneşîniyên Behdînan û Soran hemsayên Baban rewşa wan jî ji a Baban nebaştir bû.

Mîrneşîniya Behdînan, ku li jorî Mûsil dikeve, ji demên kevinan de pêk hatiye, her wehaji ew jî di nava sînorê Paşetiya Bexdadê de diket. Qesra Mîr li bajarê serekîyî Mîrneşîniyî (Emadiyê) bû. Weha Diplomasiyê Ingilîzîyê Zanevan (B.Liyard) li ser navê "Kilîta Kurdistanê" danî.

Behdîna yekê ji Mîrneşîniyên Kurdan bû, ku ew pir him ji aliyê milî ve û himjî ji aliyê oldariyê ve tevlihev bû, wisa li kêleka Kurdên Musulman Yezîdîyên Kurd, her wehaji Aşûrî, Ermenî, Cihû û Wênerên Gelên din diyan.

Di bin rewşa cengên hundurûyî no de Behdînan pêrgî sedsalên nozdehan di bû, di van cengên han de bi rengekî jêhatî Serdarên Bexdadê û Musulman têde beşdar dibûn.

Ji sala 1808 de tanî sala 1825 de Zubêr Paşa li mîrneşîniyê serdarî dikir, ê bi jîrbûn û kosîtiya xwe ve xwe ji hemû timayên serdariyê dûr dikir, her wehaji li gora pêrûniştinên Hemdemên Zubêr Paşa bi jîrbûn û hişbûnê, ligel jî bi serbûn û çarekirina diwariyan dihate nişankirin.

Piştî mirîna Zubêr Paşa Mîrneşîniya Behdînan di zîneteke keftileftî tûj de di navbera, ên di xwestin mafeyê navê Mîr wergirin, Mîran Beg, Seîd Beg, Musa Beg û Ismaîl Beg de diya, lêbelê Seîd Beg piştî hevalbeditiya Ismaîl Beg jêre ew bi serket û ew bû Serdarê bi serê xwe.

Siwarkirina Milî û ferhengî a Miletê Kurd di Mîrneşîniya Botan de, a li Rojavayî Behdînan û Hekarê dike ve, bêtir lihevkinî bû, û navîna Mîrneşîniyê bajarê Cezîrê bû, her wehaji li Mîrneşîniya Botan Malbata Mîrên Kurdan, a ji Bavikê Ezîzan tê, serdarî dikirin.

Mîrneşînî di navbera sedsalên hîvdehan û hêjdehan de di zînetê herifandinê de diya, di destpêkirina sedsalên nozdehan de ji nuh ve careke din vejiya, evjî gava di sala 1821 de Bedirxan Beg serdariya Mîrneşîniyî xiste destên xwe.

Erdên Mîrneşîniya Hekarê kohustanî bû, ew jêrî gola wanê û li bilindaya kaniyên çemê zabê mezin dikeve, ji jor û ji jorî rojava hindamên Mîrneşîniyên Wan û Xosab sînor dikir. Navîna Mîrneşîniyê bajarê Colamerg (Silîmrîk) bû, her wehaji di nava bajarê de keleheke pir asê hebû, wisajî di nava bajarê de pir mizgeft, dibustan û avaniyên civakiyî giştîyî din hebûn.

Mîrên Kurdên Hekarê ji Bavikê Şambo dihatin xwarê, Xelkên Kurd li Mîrneşîniyê ji yekitiyeke Eşîrîyî mezin dihate pêkhatin, ku ew ji komên serbixwe pêk dihatin, her wehaji di nava wan de jî ji bona Miletên din cih hebû, jiber di hin heremên Mîrneşîniyê de (Daperasîn, Tiyanî, Tobî û ên din) diyan. Xelk di bingehiya xwe de ji Aşûrî û Ermenîyan bûn.

Serdariya Mîrên Hekariyan di destpêkirina sedsalên nozdehan de bi diyarî xurt tir û firehtir di bû, jiber hêzên leşkerê Turkî di bin rêberiya (Wan) Paşa de di nivê duwem de ji sedsalên hîjdehan de bi pir hêrîşên leşkerî dijî hin ji serdarên Kurdên jorî Hekarê rabûn, ji vê rewşê û zînetê hanê Mîrê Hekarê kêş wergirt, ku wan Eşîran jêrdestî serdariya xwe bike. Di destpêkirina sedsalên nozdehan de tevaya heremên Moksa (Mokusê) bi serdariya Mîrê Hekarê ve girêdayîbûn. Her wehaji li gora hin ji kaniyan Mîrê Hekarê di pêşiya sedsalên nozdehan de dikarîbû hêzeke çekdariyî bi rengekî zor baş ji çil hezar Şervan bide pêkanîn.

Lêbelê Serdarên îranê her û her dixwestin, desthilatiya xwe li ser Serdarê Hekarê bidin zalkirin, evaya li nik Dundê Şahê îranê Ebas Mîrza, Serdarê Ezîrbêcanê, pir bi rengekî eşker hate diyar kirin, gava wîna Eşîra Kurdîyî mezin Bîlim bi aliyê xwe ve da kişandin û ew dijî Mîrê Hekarê da rakirin, piştî vê Mîrê Hekarê Mustefa paşa bi neçarê bi zalbûna Şahê îranê hate rûniştin.

Lêbelê Mîrneşîniya Soran li rojhilatî Behdînan û jorê Mîrneşîniya Hekarê diket û di sala 1787 de Rewandûz bû navîna Soran.

Di vê Mîrneşîniya hanê de salên pêşî ji sedsalên nozdehan de bi cengên hundur dihatin nîşankirin, nemaze gava Hinan ji Xwestevanên Serdariyê daxwaza yarmetîyê ji Mîrê Baban kirin û Hinên din daxwaza alîkariyê ji Mîrê Behdînan dane kirin.

Weha bi vî rengî Kurdistan tanî sîyê sedsalên nozdehan de di zemîndarên derebegîyî biçûkî de perçekirî bû, ku têde ceng û şer li ser desthilatiyê di nava Serdaran de dihatin vexistin, weha ew Aliyên westiyayî qels hêdî hêdî dihatin jibêrkin. Di vê pêla han de desthilatiya Istenbolê li ser Kurdan bes bi nav bû, lêbelê kêra Serdarên Bexdadê liser wan bêtir dibû, ew jî bikaranîna Siyaseta Osmanliyî kevin di destdirêjkirinê de, di vexistina gelaciyê de û di gûrkinina berberiyê de di nava Derebegan de bi ermanca wergirtina desthilatiya bi carekê li ser Mîrneşînan û destdirêjkirina di nava kar û barên wanî hundurê de, û liser encama vê yekê Hêzên yekgirtiyî xurt ên berê, ên Mîrên Soran û Baban hatin perçekirin, vê yeka hanê guhpêdana Serdarên Mîrên Soran û Botan, ên Xort ber bi xwe ve dakişandin, ji ber vê yekê jî wana berê xwe ber bi yek kirina Zemîndarên Kurd di dewleteke derebegî de di bin desthilatiya xwe de dan.

Xebat ji bona Serxwebûna Kurdistanê jêrî
di salên 1820 / 1840 de

Sinceqên Rewanduz, Kerkûk, Hewlêr, Kîwêsinceq, Sulêmaniyê û Herîr tev di iyala Şehrezor de bûn, kû bi Waliyê Bexdadê ve dihatin girêdan.

Di Sinceqa Rewanduz de bi rengekî bingehî Eşayirên Kurdîyî Şivzorî, Bedsanî û Rewendok dijyan. Lêbelê Eşîra Rewendok cihê sîrekî digirt û ji 12. Bavikan pêkdihat.

Di salên 1820/1830 de Mîr Muhemed, ê pir jîr û jêhatî û bi desthialt, serdarî li Sinceqê wergirt. Hêzeke leşkerî jêre zor pêwîst dibû, jiber pevçûneke pir tûj ligel Merivên wî, ên wan daxwaza serdariyê dikirin, çavdêriya wî dikin. Jiber veyeka han Mîr Muhemed Leşkerekî çekdariyî baş pêkanî û di vî babetî de bi merdbûn, malê ji Bavî wî bi destketibû, dida xerckirin, berî her tiştî ew bi xurtbûna Baregehê xwe rabû, lê ji ber bedena bajarîyî nivketî xwe li ber hêrişên Dujminê nedaya girtin, wî dest bi avaniya Kelehekî li ser carê jorî bajêr kir ku di pişt re bi navê (Nayic Keleh) hate bi navkirin. Di vî cihê hanê bi xwe de Mîr Muhemed Hêzên xwe dane civandin û enbareke çek da danîn, pêrejî ji bona parastina Rewanduz ji hêrişên Dujmin wî bendeke dinî nuh bi sê dergehên asê ji herdu rexên xwe ve, ku her yek bi du bircên Dergevanan dihate parastin, da vakirin. Her wehaji di nava bajêr de bi pêrabûnên liberxwedanê rabû û ji girîngtirîn van pêrabûnan, danîna kenalekê bû, ku bajar ji serê wî tanî dawîya wî dida binin. Mîr pêwendiyên xwe ligel erdên dora bajêr da parastin, kû di her qonexeke nîşankirî de bingehên parastinê, aramkirinê û şerkinina hemû rengên talaniyê û şêlandinê danîn.

Dîwan, a mîna desthilatiyeke serperestiyê, li Rewanduz bi kar û barê xwe destpêkir û ew bi hemû erkên desthilatiya cihî radibû. Mêjûvanê Mîr Muhemed Okeya da nivîsandin: "Hemû deriyên dîwanê li beramberî Serlêdanan vekirîbûn û guhdarî li daxwaz û giliyên wan dihate kirin. "Dibe ku Mîr Muhemed bi wan gavan rabû, ji ber berberiya wîyî tûj ligel Bira û Apên wê bû, ên cihê wî didan lerizandin. Di nava Dujminên Mîr Muhemed de Apên wî Teymûr Xan û Yehya Beg nemaze dihatin xuyanikirin, ên pir bi giranî ji bona zorbinina wan li ser wî hate rawestandin.

Piştî pevçûna xwe wî ligel Merivên xwe bi dawî anî, wî tevaya milkên wan jêr destên xwe kir û wî ji bona vegirtina heremên dorhêla xwe, ên serdarên Kurdên serbixwe, dest bi kara xwe kir. Lêdana pêşî dijî Serdarê Biradust Selîm xan û La wê wî bû, ku wî ew di awgosta sala 1815 de nêzîkî keleha xarkêl dîlkin, di piştî vê re wî berê xwe da Serdarê duwemî Biradust Hesen Beg, piştî şerê giran Hesen Beg neçarî bazdanê bû û di 12. fiqûlê sala 1815 de hêzên Mîr Muhemed keleha Biradustiyî serekî Saraw vegirtin.

Piştî Biradust Mîr Muhemed Hêzên xweyî serekî dijî Zemêdarên heremên mergever û Şino seraserkir. Di rêya xwe de ji bona Mergever re wî Eşîra Lêtan bê liber xwedan jêr destên xwe kir û di pişt re jî wî keleha Nalos vegirt. Di wê salê de bi xwe wî Eşîra Zêbarî jî jêr destên xwe kir.

Mîr Muhemed bi rengekî mezin guh bi xurtkirina rêzên liberxwedana Mulkên xwe pêda. Hosteyên çekirana çekan û Hosteyên avaniyan ên bi nav û deng ji bona Rewanduz anin û têde karxanên çekên birindarkirinê û agirî û cebilxanê dane avakirin. Pênejî ji nuhve Hêzên xwe bi raxistin, ku jimara wan ji panzdeh hezaran derbasû û bi çek û cilên baş hatibûn amadekirin, her wehaji cil û bergên Peyan û Siwaran ji hev cudabûn û komitiyeke leşkeriyî ji pênc Kesan Serpereştiya Hêzan dikirin. Pêvekirina heremên nuh bi Mîrneşîniya Mîr Muhemed ew bi hin pêrabûnên guhertinên li ser serpereştiya civakî neçarkir, Civatek ji şeş Kesan di bin navê "Serdarî" de ji bona Serpereştîkirina dam û destgehan û her wehaji sermiyankirinê li ser avanîkirina burcan, cihokan, pîran, pîrsiyariyên bazirganiyê û ên din pêkanî.

Û ji bona Mîr Muhemed serxwebûna xweyî bi carekê ji Imperetoriya Osmanî bide nîşankirin, wî pûlên ji zêr, zîv û tunc lêdan. Li ser rûwê pûl ê yekem "Al-Emîr Mensur Muhemed Beg" hate neqîşkirin û li ser rûwê pûl ê duwem "Duribe fi Rewanduz" ("Li Rewanduzê hatiye lêdan") date nivîsandin. Yekek ji giringtîrîn pêrabûnên Mîr Muhemed danîna Civata Zanevan û Hozanan ji bona danîna qanûnan bû. Her wehaji mêjûvan ji bona nivîsandina Mîriyî Mêjûyî hatin nîşankirin û cuhên avedanê û pêk anîna pîran pîr bi pêşveketin. Yekek ji gewretîrîn karên Mîr di warê avavaniyê de avakirina wîna wargeha Mîr û Serxanî bû.

Mîr Muhemed guhpêdaneke pîr mezin ji bona Serpereştiya civakê dida, di her bajar û gundekî mezin de Serpereştiyeke taybetî ji bal Mîr dihate nîşankirin û ji bona bi rêk û pêk kirina jîna abûnî bi tundî şerê pêrabûnên talaniyê û diziyê dihate kirin.

Mîr Muhemed di sala 1818 de xwe "Al-Emîr Mensur" azad ji Serdar da zanîn. Bi palpêdana xwe bi rengekî bingehtî li ser Hêzen xweyî Kurdîyî nuhî bi raxistin bi vedana desthilatiya xwe li ser heremên din ji Kurdistanê destpêkir, nebes bi tenha zor bi kartanî, lêbelê jî wehaji wî hajkinin dida bi karanîn. Weha wî heremên Herîr û Xoşnav bi aşîtî dikaribû bide wergirtin.

Di destpêkirina salên sîyî de desthilatiya Mîr Muhemed heremên fireh-jî Mosilê tanî sînorên Iranî ber digirt, û piştî desthilatiya xwe di heremên kurdî de di navbera Imperetoriya Osmanî de da xurtkirin, Mîr Muhemed bi pêvekirina heremên kurdî li Iranê bi Erdên xwe ve lêremankir (Wî ji rewş û zînetê hebû kêswergirt, jiber piştî peymanê Turkumanya aşîtî di navbera Rusya û Iranê de, tevaya guhpêdana bi carekê beramberî zînetê tevlihev di rojhilatî welêt de di bû).

Hêzên Mîr Muhemed di bin Rêberiya Murad Beg de dest bi çûna nava Laxîcan û heremên dagirtî bi Kurdên Mukriyanî kir, bêtî berambarkirina wan bi hêzeke liberxwedanêyî ku biba cihê peyvandinê, her wehaji ji bona xurtkirina paşîya Heremên vegirtî Mîr Muhemed dest bi avaniya keleşan û nuhkirina avaniya liberxwedanên kevnî niv herfî kir, Lêbelê Hêzên Iranîyî şandî ji bona berambarkirina Kurdan ew li nêzîkî gundê şah Mahmud tûşî revê û herifandinê bûn. Di vê dema hanê de metirsiyeke gewreyî sitewayî ji bona pêkhatina dewleteke Kurdistanîyî nuh hatî pêk hatibû, lê vê carê ew neji bal Iranê bû.

Piştî girêdana aşîtiyê li gel Fermandarê Misrê Muhemed Alî di sala 1833 de Sultanê Turkî Leşkerekî mezin di bin Rêberiya Waliyê Sîvasê, Reşîd Paşa de, ji bona nabûdkirina bi carekê û a heta heta a Cihêvanên Kurdan da birêxistin. Di havîna sala 1834 de Leşkerê ji çil hezar şervan bi birina hêrişê li ser heremên kurdîyî Iraqî ji aliyê bakur de destpêkir.

Lêbelê livandina Hêzên Turkî di nava Kurdistan de û tanî Rewanduz ji bona Reşîd Paşa çend mehan dirêj kir, her wehaji hatîna zivistanê biser de livandina wîna di qûlbûna welêt de da rawestandin û ew neçarkir, ku ew Leşkerên xwe di mehên zivistanê de li nava bajaran bide belavkirin û jiber giringbûna vê hêrişê jî Sultan ji bona Serdarê Bexdadê û Musilê jî ferman da, ku ew xwe tev hêzên Reşîd Paşa bikin.

Lêbelê amadekirina Hêrîşa Turkîyî givaştî tanî buhara sala 1836 de bi dereng ket, lêbelê piştî bisergirtina li ser hindama Botan Hêzên Turkî bi ber Rewanduz ve û di pişt re ber bi Akra ve hatin. Akra sê mehan bi mêrxasî li ber xwe da. Her wehajî di sala 1836 de Iran jî dijî Serdarê Rewaduzî Kurdî hate rawestandî. Di wê demê de tevaya Hêzan ber bi Rewanduzê de hatin livandin, lêbelê Mîr Muhemed dewir û berên bajêr dan xurt kirin û xwe ji bona beramberkirinê likar dixist. Li nêzîka heremên Herîr şerê giran bû. Leşkerê Kurd bi çil hezar şervan ve di bin Rêberiya Ahmed Beg, Birayê Mîr de beramberî Leşkerê Turk bi şer hat û di bin givaştinên Hêzên Kurd de Dujmin duçarî vegerê bû.

Piştî vê yekê Reşîd Paşa dest bi xapandinê kir, wî ji Mîr re nameyek nê kir, ku têde dibêje: ew berê xwe dide wî mîna ku ew berê xwe ber bi "Musulmanekî rast û durust ve" ve dike û ew ji bona wî bang dike, da bes xwîna Musulmanan bête rijandin. Weha vê banga han li ser hin ji Mele û Olperestên dor û berên Mîr kerkir. Mîr Muhemed tevaya pêşneyarên ji bona pêrabûnê gift û go dane vegerandin, lêbelê xînezîyê hin ji rêçên Rewanduz dane vekirin û di dawîya awgosta sala 1836 de Mîr Muhemed duçarî dîlbûnê bû, jiber ne avê û neji xwarinê nema têra hemû Hêzan dida kirin. Keleh ji bona talaniyê hate berdan, lêbelê Mîr Muhemedê dîl ji bona Istanbulê hate nekirin û ew bi lez bi fermanekê ji Sultan Muhemedê duwem hate kuştin. Di encamkirinê de Mîrneşîniya Rewanduz hate herifandin û Dûndên Mîr Muhemed li nik Turkan li alîkariyê digeriyan.

Hêzên Turkî li nik vegirtina bajarê Rewanduzê bi tenha ranewestiyân, lêbelê desthilatiya xwe bi ser tevaya heremên mayî ji Mîrneşînyê dan vedandin. Bi dirêjbûna sê mehan liduhev Xelkên bê guneh hatin azardan. Li gona amareke texmînî nêzîka deh hezar Kurd hatin kuştin, her wehajî pêrejî pir gund hatin talankirin û sûtandin.

Wehajî zîyanên Turkan jî pir geurebûn. Weha pêş û halan jî Leşkerê Turk didan mirandin: bes û bi tenha di dorgirtina kelehek Kurdî de nêzîka çar hezar Serbazê turk mirin. Di dêsembera sala 1837 de Reşîd paşa li bajarê diyarbekrê, piştî vegirtina wîyî kolêra, ew pê mir.

Cêhê Reşîd Paşa Hafiz paşa wergirt û di havîna sala 1837 de ji nuh ve şerên Leşkerî beramberî Kurdan ve rabû. Tevî bi kuştina tevayî a Xelkê jî, wî pir ji Kurdan jî ji bona cihên din dan sorgonkirin.

Hêrîşa hafiz paşa li ser Kurdistanê bi sebaba pevçûna nuh di navbera Serdarê Misrê de Muhemed Alî û Turkan de hate rawestandî. Hêzên Hafiz paşa ji Kurdistanê hatin kişandin û di yunya sala 1838 de li nêzîkî Nîsêbînê li ser destên Misriyan ew hatin tar û markirin. Pevçûnan ji nuhve di nava Xelkên Kurd de destpêkirin.

Qonaxa pêşiyî "vegirtina" Kurdistan di sala 1839 de hate dawîkirin, a mîna qonaxeke zordariyî dirindane beramberî liberxwedanên Gelêrî tête danîn. Rêya pêdeçûnê ji bal Talankerên Turk bi şûr û agir dihate qelişandin. Serperiştiya Turkan li welêt sitemkarî dikir û welat di pir hereman de date çirandin. "Li dêlva Sermiyandariya bavî-Valmîrayer dide nivîsandî, a li serê qafên çiyayên welêt derket û belav bû, Zordarên Hovber ji Istanbulê hatin, da ew bi leztirîn dem û bi hisantirîn rê vegerînin, ew bertîlên ku wan ji bona bi destxistinên cihên xwe dabûn"

Fermandarê Bexdadê Muhemed Paşa bi dirbûneke taybetî dihate nîşankirin. Piştî vegerandina wî ji hêrîşa wî dijî Kurdan "Jimareke pir ji guhan, ên ji serên Raperînvanan piştî kuştina wan birîbûn, bi dergehên bajêr vekiribûn...Wî tirs di tevaya Xelkên Bîrocûk de dida firandin, bi qazoxkirina wan ger ew carekê li ber fermana wî rabin."

Hindama Botan bû navwendiya vejandiyî nuh ji bona tevgera rizgarkirina kurd. Serekê Mîrneşîniyê li cihê xwe li cezîrê Bedîrxan Beg xebat rêberdikir û desthilatiya wî tanî Diyarbekir fireh bibû.

Di salên sihî de Bedirxan Beg dikarî bû xwe ji pevçûna xweser li gel hêzên Reşîd paşa bide bidûr xistin û wî dikarîbû ji xwe re hêzên leşkeriyî mezin bide hiştin. Her wehaji tirsê wî dilê Patîşahê Bexdadê û Musilê jî digirt. Pêrejî wî serxwebûna xwe ji dewleta Sultan jî ne dida veşartin.

Bedirxan Beg kesa herifandina leşkerê Turkî liser destên Misriyan ji bona firehkirina mulkên xwe wergirt, her wehaji wî pêwendiya xwe li gel Dujminê xweyî berê Fermandarê Hekarê Nurelah Beg dikarîbû bide çak kirin û ligel wî ji bona rawestandina wan bi hev re beramberî Sultan lihevhat. Her weha jî Fermandarî moksa Evdal xan ber bi aliyê xwe ve da rakişandin.

Bi lez wan serokên Kurdan peymanê hevbeşî raperîne bi hev re dane girêdan, her wehaji Waliyê Erdelan, Fermandarê Kurdî mezin li Iranê, tev li wan bû. Peymanvanan dest bi nuh kirina avanîkirina keleşan, çak kirina liberxwedanên nivketî û her wehaji bi bêtirîkirina jimara hêzên xwe kirin.

Bedirxan Beg bi alîkariya Hostên çek, ên wî ew ji bona veyekê ew anîn, dî karxanên çek û cebilxanan li cezîrê dane avakirin. Vî karê hanê cihê wî di navbera Serekên Eşîrên Kurd de daxurt kirin, û ji bona peydakirina karnasên jêhatî di warên Leskerî de Bedirxan beg Xortên Kurd ji bona Ewropa ji bona xwendinê ew rêkirin. Her wehaji ji bona rakişandina Ermeniyan û Aşûriyan, ên li gel kurdan diyan, ber bi aliyê xwe ve dankişandin. Ji bona Ermeniyan Bedirxan Beg di dewleta xweyî Kurdistanî hatî de Serpereştiya abûrî datanî. Bi lez jimareke mezin ji Ermeniyan û bi rengekî bingehî ji herema Dîx tev li leşkerên wî bûn. Her wehaji hin ji Sêwirdarên Bedirxan Beg ji Ermeniyan bûn.

Bedirxan Beg dikarî bû jîyan û malên Xelkê, ên di heremên bi serdariya wî ve girêdayibûn, bi de parastin, dawîya talankirin û diziyê bîne anîn û civandina bacan bide binêxistin, veyeka han cihê wî di nava Xelkê de da berz kirin.

Di çaxa gerên xwe de li Kurdistanê Dêtelê pir çaran li ser rêyan pêngî komên pir ji Kurdan dihat, ên ber bi Bedirxan Beg de awar dibûn "Li nik wî-Dêtelê dinivîsîne-qanûn û mercên wî hene, ên ew li ser bingehên wan Erdan dide parvekirin, lêbelê aramî û aşîti ji giringtirîn qazanca wan mercan bi xwe ne." Ji mercên pêşiyî ku ji her kesekî dihate xwestin, ku ew ji bona nik Bedirxan bête guheztin, divabû ew xudan hesip, tîfing, şûr û demage ba. Vê yeka hanê palpêdaneke mezin ji bona gewrebûna bi lez ji bona Hêzan da.

Ewropiyên, ku di nava erdên wî re derbas dibûn, ew pir bi dîtina ewlebûnê behetî diman, jiber mîna ewlebûneke weha wana li hic goşeke din ji welatên asya ne didîtin.

Her Cotkarekî Kurd, ku ew diçû ba Bedirxan Beg, perçeyekî erd beramber bi çend qûrûşan bi dest diket, her wehaji wî pir bacekê kêr li ser teşê xwe dida, lêbelê Xelkên, ku di tengayeke diravî de diyan, Bedirxan Beg ji wan re yarmetiyan diravî dida pêşkeşkirin. Mirovên bi çavên xwe dîtine dane nivîsandin: "Beg pûl li ser bi sedan ji Biyan, zarokên Sêwî û tawîyan dane belav kirin".

Yekek ji giringtirîn gavên Bedirxan Beg bû, rêkirina wî a xelkê ji bona Ewropa da ew zanistiyên nuh bixwinin.

Piştî ku Bedirxan Beg rewşa xweyî Leşkerî, Siyasî, Civakî û Abûrî da xurt kirin, di rastiya rastyê de ew ji Serdar azad bû. Wî bi lêdana pûlên xwe destpêkir, ku li ser rûyekî ji wan: "Emîrê Botan Bedirxan" hatibû neqîşkirin û liser rûwê din mêjûwa-sala 1258 koçî (sala 1842) hatibû nivîsandin. Her wehaji Bedirxan Beg bajarê Cezîrê bi paytextê dewleta xwe da zanîn, pêrejî Ala Kurdî hata berz û bala kirin. Serekên Kurdên Hevalbend li ser piştigirtin û parastina dewleta nuh sund bi hev re xwarin. Lêbelê di vê dewranê de bûyînen ku di nava erdên Bedirxan de dihatin kirin, bi rengekî bermeqlubî ji berê çûna tevgera rizgariya welatiyî Kurdî dihatin bi pêşveketin. Pêwendî di navbera Rêberên Kurdan û Serokên Aşûriyan de nebaş dibûn, ên li heremên Hekarê li-Mar şemûn, Mar Yuhena diyan, Şandiyên Filekirinên Emerîkî û her wehaji Balozxana Diplomasiya Ingilîzî bi roleke serekî ji bona vexistina vê gelaciyê dane yarîkirin, her wehaji ji bona kişandina Aşûriyan ber bi aliyê xwe ve wana her û her kardikirin. Wana ew li vê hindama Sitiratiyî giring ji Turkiyê ji xwe re nala bingehêkî danîn.

Pêwendî di navbera Kurdan û Aşûriyan de her û her nexweştir dibûn, tanî ew bi qonaxa Şerên Leşkeriyî xweser di navbera wan de hate gihaştin, ev tev bicarekê jî li berjewendiya Serdarên Turkan bi xwe bûn.

Fermendarê Musilê ev pevçûnên di navbera Aşûriyan û Kurdan de bi qelsbûna herdu aliyan datanî û ew pevçûnên hanê dê jê re, ji bona ew zora herdu aliyan bibe, pir alîkarbin.

Wî nav di Kurdan dida ji bona ew hêrişê li ser Aşûriyan bikin, her wehaji pêrejî li gel Ingilîz di hem demê de wana Sultan dijî Bedirxan han didan. Ev kar û barên Çavdêran bi xurayî nehate rijandin. Di sala 1843 Begên Kurdan Xelkên Aşûrî dan kuştin û serjêkirin. Aşûriyan nameyeke pirotestayî resmî ji bona Konsulê Ingilîzî Rasam li Musilê, ê di binyadiya xwe de Aşûrî bû, pêşkeskirin.

Rasam di rêya Balozvanê xwe de li Istenbolê ji Sultan ji bona sizakinina Bedirxan Beg da xwestin. Evaya bi xwe bû, a ku Dewleta Sultan pê pêwist hebû, jiber ew neha dikare bê hiç kelemekî li ber xwe dest bi amadekirina hêrişeke nuh li ser Kurdan dest pêbike. Di pêşiya pêşî de Hafiz paşa Fermendarê leşkerê Enedola Rojhilat li ser hate danîn, ku ew bi rêyên aşîtiyê bi pêrûniştina Bedirxan Beg bi desthilatiya Sultan li ser xwe bide wergirtin, lêbelê ew hemû pêrabûnên hanê çî di rêya diyariyan de yanjî di rêya Mênêrên rêkirî de ji bona Bedirxan Beg sernegirtin.

Di adara sala 1847 de likarxistina Hêrişê Leşkerî dijî Kurdan destpêkirin. Her wehaji Osman paşa Serleşkerê nuh ê hêzên Turk li Enedola Rojhilat bi jêhatbûn dest bi kar kir. Her wehaji fermana giştî da zanîn. Di nivê gulana sala 1847 de Leşkerê Osman Paşa ji bona hêrişkirinê likar bû.

Di hizêrana sala 1847 de Leşker ber bi jor de hate daketin. Di dest pêkê de dora Liberxwedanên hevalbendên Bedirxan Beg ji jorî cezîrê da dorkirin. Lêdana pêşî ji bona Ebdal Beg bû. Jimara hêzên Turkiyî beşdarîkirî di pêrabûnên leşkerî de bêtir ji bist û pênc hezar Serbaz bûn. Lêbelê Hêzên Kurd di navbera 15. - 17. hezar kes bûn.

Bedirxan Beg xwe bi başî ji bona beramberkirina Dujmin amade kiribû. Her wehaji cihên çiyayî yên pir dujwar bixurtî hatibûn girtin, ku hêriş li ser wan pirî dujwar bû.

Di Beramberbûna pêşî de, tevî pirbûna hêzên Turkî bi jimara xwe ve, Kurdan bi serketin wergirtin. Lêbelê di encamkirina xiyaneta Rêberê perê rast Yezdansêr de Leşkerê Turkan pişt li Bedirxan Beg girtin û ew ne neçar kirin, ku ew cihê xwe bide berdan. Weha wî ligel 5. hezar şervanan xwe li keleha Arox girtin. Kelehê sê rojan liber xwe da. Di 20. gelawêjî de Bedirxan Beg neçar bû, xwe ber destî Osman Paşa bike, piştî ku wî soz liser girawkirina jîna Asêvanan wergirt Piştî nabûdkirina liberxwedana Kurdan hêzên Turkî jimarek ji gundên Cezîrê kaviil û wêran kirin, wehaji pêrejî gundên Bedirxan Beg jî li mazadê hatin firoştin û Bedirxan beg li gel mala wîna dibin çavdêriyeke tûj de ji bona Istenbolê hatin bi rêkirin.

Piştî Dîlbûna Bedirxan Beg Osman Paşa hêrişê sertewandîne beramberî Serêkên Kurdên din li ser pêde çû. Di 15. awgostê de Leşkerê wî bajarê Sêrtê vegirt û Xelkên bê guneh dane kuştin û gurandin.

Cenga pêşmergetiyê li Kurdistanê dirêj dikir, a ne berjêrketinî û neji birçîbûnê, her wehaji neji Kolêra, a dest bi belavkirina xwe kiribû, ne dikarîbû vê cenga hanê bêne dawîkirin. Bi hezaran ji Cotkaran bi van Bapêşan hatin gorîkin û ên di piştê jî Leşkerê Osman paşa jî bi ber xwe vekirin. Di zivistana salên (1847 / 1848) de bes û bi tenha sêçarî Hêzên wî li bajarê Bedlîsê bi van Bapêşan mirin.

Dewleta Sultan biserketina li ser kurd tanî radeyekî weha pir bi giringî da danîn, ku wê di dawîya hêrişê Osman Paşa de Mêdaliyeke taybetî da derkirin, li ser rûwê pêşî keleha Bedirxan Beg Arox hate wênekirin û li ser rûwê din (Mêdaliya Kurdistan) hate neqîşkirin.

û ji bona beramberkirina raperînên Kurdîyî, ku dibe, di ayinde de ew bêtin kirin, Orduwên Turkî li tevaya nawendiyên Kurdîyî bingehî hatin bicihkirin, her wehajî guhertinên nuh li ser perçekirina Serpereştiya hereman hatin kirin. Heremên Cezîrê, Hekarê û Berwariyan tev de di serpereştiyekê de yek kirin.

Tevgra Kurd di qonaxa Cenga Qırım de. (Pêncîyên sedsalên nozdehan) de. Hêrişên Leşkerê Turkî li Kurdistan di navbera salên 1820/1840 de cihêbûna Zemîndarên Kurdî ji hev datin xistin, her wehajî Mîrneşîniyên azad û niv azad jî dane nabud kirin.

Hêjî Serpereştiya Turkî xwe li ser lingên xwe li Kurdistanê negirtibû, gava li pêşiya wêna pîrsa amadekirina cengeke nuh beramberî Rusya hate danîn, her wehajî pêrejî dewleta Turkî di navbera xelkên Heremên Rojhilat de rêz li ne dihate girtin. Hêjî talankirinên Leşkerê Turkîyî dawîyî di wê demê de li Kurdistanê liber çavên mîlet bûn, pêrejî bi serdejî bi derkirina jimareke mezin ji Serokên Kurdên Desthilat Dewleta Sultan bi xwe bi rengekî pîr mezin ji wê bingeha Civakî da bê parkirin, a ku di rêya wê re dikaribû bêtin li ser Kurdan bide kêr kirin.

Dilmayîna kurdan bi diyariyek bi çarekê beramberî Desthilatiya Turkî hate derketin: her bangek ji bona serbazkirina Kurdên nuh bi darê zorê dihate bicih kirin. Gijbûnê di dema serbazkirina kurdan de bi diyarî dujminatîya di navbera Xelkê û Desthilatiya Turkî de dida derxistin, jiber wêjî serbazkirin mîna karê (Nêşîrvaniya Mirovan) dihate derketin, ên wisa dest li pişt girêdayî Turkan ew tanin. Pîr Zilam ji bona rizgarkirina xwe ji serbazkirinê ber bi çiyayê de direviyan, bes û bi tenha hêviya dewleta Turkî li ser Eşîrên Kurdîyî, ên li ser sinorên rusya rûniştibûn, dihate girêdan < ji ber wê ew bi şêlandin û talanên cengê didan dilbijandin. Tevlivêjî rawestandina Piran jî ji wan bi dudilî beramberî cenga hatî dihate nîşankirin, weha wan bi karîna serketina Hêzên Turkî bawer ne dikirin, her wehajî rawestandina xelkên Kurd li pişt qafqasiya Rusî jî bi rengekî giştî dijî turkan bi xwe bûn. Ji wan Rêberîya leşkerî Rusî du hêz di bin rêberîya Serheng M.T. Loris Milokov pêkanîn, ku wan mîrxasî û karîna xwe di hemû waran de dan derxistin.

Li aliyên Turkan Kurdan bê dilê xwe şer dikirin û tevaya wanî, ku bi Leşkerê Turkî gihaştibûn, ji 4.-5. hezar Siwar hebûn. û di gava reva mezinî pêşî de li ser anîya Qefqas ji cenga Rojhilat (Qerim) a di payîza sala 1853 de veqetibû, di gava Rus lédana xweyî pêşî li nêzikî Başkadîlar li Leşkerî Ahmed paşa di desembera sala 1853 de bi cihanin, Kurd ji Turkan xweser cihêbûn û çekên xwe baramberî wan bi karanin û mayîna wanî mayî anîn.

Bînavan dibêjin, bê çawa Kurdan Turk bi bînferehbûn û xwîngembûn nabûd dikirin, û ji tevaya Hêzên rênistiyî Turkiyî beşdar di wî şerê de, ên bi zor xwe bi Qersê gihandin, bes û bi tenha ne bêtin ji 5.- 6. hezar serbazbûn, her wehajî di Dêsembera sala 1853 de 14. maqûl ji Eşîrên Bêzîkî, Cemandêlî û Mêlanî, ên ku di destpêka cengê de li gel Turkan bûn, ew bi Eleksender Pol gihaştin û dilsoziya xwe ji bona desthiltîya Rusî dane derxistin Di dêsembera sala 1854 de Loris Milokov li gel Serkê Kurdî mezinî bi desthilat Qasim Xan gift û goyên bi serketî kirin, ku wan cihê Rusan li ser heremên sinor di nava Kurdan de date xurtkirin.

Her wejî bi serketinên Hêzên Rusî li nik Kuçûk-dêrî (li bilindayên çînkilisk) di gelawêja sala 1854 de û vegirtina wanî Bajarê Beyazîdê kêreke bi rengekê pîr mezin di derbasbûna bûyînan de li Kurdistan dane kirin. Weha van bûyînen hanê Xelkên bîdil li ser desthilatiya Turkî bêtin bi mehne dikirin, ji bona ew li ser Turkan raperin. Weha Berpirsiyarê Leşkerî Rusî Lixotin dide nivîsandin: "Durûyî, nebûna dadîyê û sitemkariya Paşê bi lez û bez ne bes tenê bîntengbûna giştî li nik Kurdan lêbelê jî li nik Aşûriyan jî date gûrkin, ên bi çavên xwe didîtin, ku Serpereştiya Berpirsiyarên kurd ji Serpereştiya Paşê hêsantir û baştîre". Ev rastiya hanê jî pîr Rojnemevanên Ewropî dan xuyanîkirin.

Di vê pêla hanê de li Kurdistanê yekek ji gewretirîn şûreşan di bin Rêberiya Yezdanşêr Biraziyê Bedirxan Beg de hate vêketin. Vê şûreşa hanê tevaya Heremên Cezîra Botan û Hekarê dene ber xwe. Yezdanşêr bi du hezar Şervanan ve berê xwe da bajêrê Bedlîsê.

Bi alîkariya mezinî Xelkên cih bi hêsanî bajar vegeirt û Qayimqam Alî Beg hate kuştin. Raperîn bi lez û bezeke pir mezin hate firehkirin. Weha Xelkên Kurd li heremên jêrî Wanê û Muksa di bin Rêberiya Têlî Beg de xwe bi Leşkerê Yezdanşêr ve gihandin, her weha jî Zarowên Bedirxan Beg bi hêzên mezin xwe pêve gihandin û wan ew Hêzên hanê beramberî Serdarên xweyî Turk kirin. Xelkê jî û di nava wan de jî Filan (Aşûriyan) jî alîkarî ji Şûreşvanan re pêşkeş dikirin. Vê şûreşa hanê nav û cergên Serdarên Turkan didan lerizandin. Weha Rojnemevanê rojnama "Kurir di Liyan" ji Îstenbolê dide nivisandin: "Dewleta Osmanî xwe kar dike, ji ber şûreş roj bi roj xurttir dibe, a ku dê vemirandina wê pir dijar bibê, ji bona ew cihên fireh negire û her wehaji ji bona ku Xelkên File li Ermînya û Anadolê xwe nexin bin ala wêna. Bê berengariyeke bi tî Hêzên Yezdanşêr, ên jimara wan bi 30. hezar ve gihiştin, heremên Kurdî li jêrî gola Wanê û tanî Musilê tev de vegirtin. Wan li bajarê Musilê karxaneke topan xistin destên xwe, Karmendên cihîyên Serdar tev de derkirin û her wehaji pêrejî xizna bajêr xistin nav destên xwe, her wehaji Kurdên yezîdî li musilê piştgirtineke pir jêhatî ji bona Yezdanşêr pêşkeş kirin. Mîrê Yezîdîyan Hisên Beg Leşkerê Turkan, ê ji 5. hezaran Nefer pêkhatibû, tar û mar kir. Her wehaji 5. top ji Dujmin sitandin û bajarê sêrtê da vekirin.

Dewleta Turkî beramberî zîneteke pir dujar dibû, ji ber hêzên wêyî bingehiyî serekî di aniya Rusî-Turkî de dihatin dîtin. Beramberî Yezdanşêr di dîsembera sala 1855 de Leşkerê ji Bexdê hatî di bin Rêberiya Kenan Paşa de di hate rawestandî, yê ku bi lez û bez ji dorhêla bajarê hatibû civandin. Weha ev Leşkerê hanê bi şerê pêşî ve li gel Kurdan li nêzîkî bajarê Sêrtê hate let let û qirkin. Wisa jî Xelkên Yunanî û ên Ereb jî hatin nava vê şûreşê, pêrejî dildariya Eremaniyan bi vê şûreşê re zor diyar bû.

Di febrayera wê salê de jimara Şûreşgêran bi 60. hezarî ve gihişt. Wetov Lixotin dibêje, ku Miletê bîzarbûyî ji dizîya Karmendên Turk ew ji her cihî derdikirin û ew didan kuştin. Weha ew dinivîse: "... Hin ji Berpirsiyarên Sînceq û Qayimqamiyan dibêjin, ku 16. Mîrov hatin kuştin".

Yezdanşêr di xwest garmetîyê ji Rusan wergire, ji ber vê yeka hanê jî ji bona pêkanîna pêwendîyan li gel Serekên Leşkerên Rusî wî kar dikir. Piştî ku Rusan Beyazîd vegirtin, Yezdanşêr pênc carî name ji bona Serekên Leşkerê Rus nekirin, ku wî ji wan daxwaz dikir, ku ew jêhatbûnên şeran ber bi jêr de bidin gurkirin. Wî ji bona yek kirîna Hêzên şûreşê û Rusan li nêzîkî bajarê Bedlîsê nêz kiribû, da ew di pişt re bi hev re ber bi Erzeromê de xwe berdî. Lêbelê ev nameyên Yezdanşêr bi cihê xwe ve negihaştin, jiber Leşkerê Rusan ji wê heremê hatibû derketin. Lixotin, ê di wê demê de Serekê leşkerê yêrîvanî bû, dide derxistin, ku gerjî Rêberên Leşkerî Rusî jî ew nameyên hanê jî werbigirtana, dê wana jî nikariba bi pêrabûnên girîng rabana, jiber Hêzên Rusî pêrabûnên xwe di zivistanê de da bûn rawestandî.

Şûreş di febrayer û adarê de giha gewretirîn firehbûna xwe û şerê leşkerî linava Ermînya Rojava belav dibû. Weha Yezdanşêr ji Paşê Wanê bi dana bajêr daxwaz kir. Şûreş jî vê jî bêtir gewre û firehtir dibû, ew bi Erzerom û Beyazî de ve jî gihişt. Di vê pêla hanê de Rêberiya Leşkerê Turkî neçarbû, ku Beşekî ji Hêzên xweyî aniya Rusî-Turkî dijî Yezdanşêr re bike. Lêbelê di pêşîya adarê de Muhemed Paşa Serekê Leşkerê Turk, ê dijî Kurdan şerdikir, dikarîbû li nêzîkî Gundê Deryan, li nêzîkî bajarê cezîrê Şûreşvanan bi de şikenandin. Di vê zînetê hanê de Konsulê Ingilîz li bajarê Musilê distîndinê jî nava bûyînan kir û bi karên pir jêhatî hajbûn di navbera jimarekê ji Axên Kurdan û dewleta Turkiyê de pêkanî. Weha Yezdanşêr pêrabûnên şer bi neçarî da rawestatîndin û ew li gel mala xwe li keleha Qesra gelîyî pir asê li herema cezîrê penabû. Di destpêkirîna şerê nîsanê de yezdanşêr ji bona Ser Leşkerê yêrîvan careke din bi pêşneyarek diyar û nîşankirî pêşkeş kir, ku ew ber bi Mûşê de bê û ji wê derê ew ber bi Bedlîsê de bê, jiber ew li wir dikare xwe bi Leşkerî Rusî ve bide gihandin.

Yezdanşêr yarmetiya çavdêr ji kesekî wernegirt, jiber vê jî wî hêviya biserketnê nema didît, wî di bin kêra Kosulê Ingilîzî de gift û go li gel dewleta Turkî da kirin. Piştî baweriya wî bi sozê Konsulê Ingilîzî hat, bi wergirtina gotina namûsê ji wî, ew ji Qesra gelî ji bona gift û gokirinê li gel Turkan derket, lê belê bi bê bextî ew hate girtin û bi lez û bez ew ji bona Istenbolê hate rêkirin.

Bi bê Rêberkirina şûreşê ji Rêberiya wê ew bi lez hate herifandin. Hêzên Turkî bi bi bê xwênrijandineke pir Kurdistan careke din jêdestkirin.

Metirsiya wê şûreşê ji bona turkiyê weha gewrebû, ku Dewleta Turkî piştî wêrakirina wê Mêdalyeke taybetî date derkirin. Her wehaji bi lez û bez careke din ew hêzên li Kurdistan ji bona aniya Rusî hatin veşandin. Lêbelê jî hevkarîya şer a rastû dîrust di navbera Rus û kurdan de tanî piştî dawîkirina şûreşa Yazdanşêr bi xwe jî ew ma. Rêberiya leşkerê Turkî bi tirs li girêdana pêwendiyên di navbera Rus û Birayê yezdanşêr Omer Axade, ê di nava kurdan de pir bi cih bilindî lê dihate nerin, wan lê didan temaşe kirin. Ji ber wî bi deha hezar Servanên Kurd ji bona yarmetiya Leşkerê Rusî dikarî bû bida pêşkeşkirin, lêbelê hêzên Rusî xwe ji bona ketina qulbûna nava Erminya Rojava xwe bi nêt ne dikirin<ji ber kelha asê ya Qersê di pêşiya wan de dihate dîtin, tevî Kurdên herama Qarsê rê liber livandina Rusan kelem nedikirin.

Serekê mezin Qasim Xan, ê kêreke pir mezin li vê heremê dikir, pêwendiyên dostaniyê her û her li gel Rusan di rêya Liris Milikov dida parastin. Bes û bi tenha ketina Rusan li Qerim guhestina Qasim xan bi êşkere ji bona aniya Rusî date rawestandî. Vê rawestandîna hanê ji bal Qasim Xan li nik Rêberên Leşkerê Rusan cihê lêgumankirinê û nerazibûnê da derxistin. Tev li vê jî Qasim xan bi hiq renekî bi Turkan bawernedikir. Ji ber vê jî li ser hamû bangên Serleşkerê Enedolêyî Turkî Kerim Paşa, her wejî bi ên Waliyê Qarsê Sarî paşa jî ji bona hatina xweyî Qarsê, ew razî ne di bû. Pir Kurdên Qasim Xan bi mehnên cuda ji serbazkirinê ji nava Hêzên Turkan direviyan.

Di dawîya teboxê de Hêzên Rusî dora Qarsê bi carekê dane girtin. Loris Milikov hêzên pêşmerge ji (Gurciyan, Ermeniyên, Kurdan û ên din) dan pêkanin, ji bona ew kerwanên guhestinên Xwarin û vexwarinê ji bona leşkerê Turkî li ser bidin hêrişkirin. Kurd bi xwîngermiyêke pir germ di nava wan Hêzên de beşdar dibûn. Mêldariya kurdan di paşetiya Qarsê de ji bona Rusan bi renekê bingehê li ser encamkirina Pêwendiyên baş a Leşkernê Rus li gel Xelkên Cih dihate avakirin. Bes û bi tenha Leşker xwarin û vexwarin ji Xelkê beramber bi peran werdigirtin. Bi ruxndina Qarsê di yenyera sala 1855 de pêrabûnên şer bi renekê bingehî di aniya qefqasê de hate dawîkirin.

Cenga Qerim bi diyarî dijûnên kûr di navbera Xelkên Kurd û Dewleta Turkî de da xuyanikirin. Evaya bi taybetî di pêla Şureşa Yazdanşêr de hate diyar kirin. Her wehaji pêrejî bi xwe Mêldariya Kurdayî mezin ji bona Rusan da xuyanî kirin. Wisajî bédiliya Kurdan tanî piştî cengê jî dirêj dikir. Weha şûreşa kurdî mezin di sala 1868 de hate vêketin, tevger di Wilayeta Diyarbekrê de di nava Eşîrên Raşkotanî û Kurdên yezîdî de destpêkir. Wehaji herema Dêrsimî çiyayî de jî dest bi raperînekir. Pir şerên giran û mezin di navbera kurdan û Hêzên Turkan de di paşetiya Mûşî de, di Paşetiya Wanê de û di Paşetiya Erzeromê de hatin vêketin. û li gora nûçeyên Moravîyêva, "encamkirina van şeran Xelkên Paşetiya Beyazîdê didin diyarkirin, ku Kurd û yezîdî têbêje ew çavdêriya gihaştina Hêzên Rusî dikin".

Rawestandîna Kurdayî dujminayeti beramberî Turkan û herwehaji xebata wanî rast û dîrust ji bona serxwebûnê piştî cenga Qerim bi pir diyarî li Dêrsimê hate berz û bala kirin.

Tevgera Kurd di şêst - û heştîyên sedsalên nozdehan de

Mêjuwa serjêrkirina Dêrsimê ji Sîyan de destpê dike, gava Leşkerê Reşîd paşa piştî hêrişê Mîsrî ji bona serberjêrkirina Kurdistanê hate vegeradin. Di wê pêlê de Rêberê xebata Dêrsimyan di bin Rêberiya Şêx Hisên Beg de bû, ê Serekê yek ji Eşîrên pir xwedan kêr bû.

Berî destpêkirina cenga Qerim Dewleta Turkî bi pir hêrişên leşkerî li dûhev li ser dêrsimê kirin, da ew dawîya Hêzên xwe ji hêrişên Kurdên Dêrsimê ên ji nişkêve bide parastin. Weha Leşkerê Turkî, ê ji 15. hezar nefer pêkdihat, ji bona serberjêrkirina Dêrsimê bi dirîtiyeke bê hempa û bê dilovanî li gel xelkên bê guneh bi hêrişê xwe destpêkir. Pir ji xelkên Kurdistanê mîna Bendan ew ji bona îstebolê didan rêkirin, her wehaji pîrejî Hêzên Turkî li gel Serekên kurdan pir rêyên hov û dir mîna darvekirinê, li qazoxê xistinê, şewitandina bi saxî, bisendakirina neftê û agir pêvedan û gurandina wan bi saxî didan kirin, belê Turkan li wan kesan weha dikirin, ên wan bi bêbextî didan girtin. Alî Beg (lawê Şêx Hisên Beg) ne dikaribû rêxistina liberxwedanê lidarxîne, ji ber vê jî wî xwe bero paş ve digşand, da ew Leşkerî Turkan ber bi cihê çiyayî yê asê de bide kişandin û di piştê wî perçe li dû perçe bide qirkirin. Lê belê Hêzên Turkî, ên di şeran de hatibûn westandin, xwe ji Dêrsimê dane kişandin, da ew bi carekê neyên qirkirin. Wana bes hin ji Hêzên xwe li hin cihên navînî sitiratioyî dane hiştin. Piştî derketina Hêzên Turkan Mamûrên mayî ji Turkan bi lez û bez ji Dêrsimê duçarî bazdanê bûn. Weha bi vî rengî hemû karên pêrabûnên Turkan berî destpêkirina Cenga Qerim, ku ew Dêrsimê bi cihekê nawendi ji bona amadekirina Cengê dijî Imperatoriya Rusî bikin, bi ketinê hate dawîkirin. Piştî cenga qerim careke din Dewleta Sultan ji nuh ve ji bona bi serberjêrkirina Dêrsimê destpêkir, lêbelê Hêzên Turkiyî westiyayî vê carêji tevaya Dêrsimê nedikaribûn jêrdestên xwe bikin. Bes û bi tenha wan li hin cihên, ku ên berê di bin destiya wan de bûn, Serpereştiya xwe lê bidin bi cihkirin. Serdariya Turkî liberket, ku ew bi hêza çekan Kurdên Dêrsimê nikana serberjêr bike, ji ber vê yekê jî wê siyaseta "Şekin û dar" destavêtê û date bikaranin, a ku bi serketinê bêtir hate diyarolê tê, ku ji bona nimûne Serdarê Erzeromê Samix Paşa "dikaribû Xelkên Cih ji Kurdan bi du Bendên Dujminên hev bike, ku her yek ji wan li nik Dewletê li piştgirtin û diyariyan digerin".

Nexweşbûna rêyan li Dêrsimê hêrişên Turkan yê Serberjêrkinê ber gelem dikirin. Desthilatîya Turkî ji bona hilanîna wan geleman ji ber xwe Xelk neçar dikirin, rêyên Diyarbekrê tanî Erzeromê, ên di Bolomor, Xozan, Mazgêrt û Palo re derbas dibûn, bidin vekirin. Samix Paşa evaya bi mehne danî, ku Kurdên Dêrsimê hêjî carekê ji caran wana Bêş û Bacên xwe ne dane, wî soz da, "Li karê Kurdan di vekirina rêyan de nala dana Bêş û Bacên derengî, ên ku divabûn bihata dayîn, lê tete nerîn, her wehaji bes û bi tenha bi pêşkeşkirina sê ceman nan di rojê de ji bona Karkerên Dêrsimê li ser xwe danî". Weha fermanên Samix Paşa ji ber liberxwedana bi jêhatî ji bal Xelkên Kurd bi carekê bi serneketin. Pir ji Began ji ber Şelafiyên xwe ji bona Desthilatîya Turkî ne jîna xwe gorîkirin. Weha Kurdên Bêzarbûyî Qayimqamê Dêrsimê Xolya Beg dane kuştin.

Pêwendiyên nobûyî di navbera Imperatoriya Osmanî û Rusya de, ên ku bi Cenga Rusî-Turkî di salên 1877 - 1878 de hatin destpêkirin, bi lez û bez wana li ser rewşa Politikî li Dêrsimê date kêrkin. Weha hin ji Desthilatîyên Begên Kurdan pêwendiyên xweyî bi dizî li gel Rusan danîn. Gava Mensur Axa - Qayimqamê Xozanê - bi kombûna Hêzên Rusî li Aleksenderpol pê zanî, wî Wênerekî xweyî pê bawerî ji bona Rêberên Leşkerê Rusî li gel pêşkeşkirina amadebûna karkirinê li gel wan rêkir, ser ew ber bi Dêrsimê de bîn. Meşayixên Kurdên Rêça (Alî-îlahî) dest bi ragiyandinê kirin, ku Serfirazîkirina Kurdên Dêrsimê bi alîkarîya Rusan fermana Xwedayî ye.

Li gel destpêkirina Cengê Desthilatîya Turkî Hestîya Oldaryê li nik Kurdan di hemû Wilayetên Rojhilat de di xwest geş û gûr bike, lêbelê ev karê wê tev bi carekê bi boşayî çû. Her wehaji Kurdan li ser daxwaza Turkî ji bona pêşkeşkirina Serbazkirinê bi beramberkirinan dane vegerandin, ên ku bi Raperîna

Çekdarî hatin guhestin. Weha di Çirya Pêşî (Oktoberê) de sala 1876 de Samîx Paşa bi birûskekê hate agehdarkirin, ku Kurd li Heremên Mûşê, Bedlîsê û Wanê ne bes tenê Jimara Daxwazkirî Serbazan pêşkeşnakin, " Her wehajî péréjî ew Serbazên Hilanîné jî, ên ku berê Serbazbûn û navên wan di listên Serbazkirinê de hatine, pêşkeşnakin ". Şah Hisên Beg li Kozincanê li ser daxwazên Samîx Paşa bersev da, ku ew bi mercekî amade ye, Hêzan dê ew pêşkeş bike, ger ew bi xwe Rêberîya wan bike. Weha Dewleta Sultan bi neçarî bi vî mercê han rûnişt. Lêbelê Kurdên li Jêrdestîya Şah Hisên helwestandina wî baş nedîtin û wan da zanîn: " Em Bacan nadin, Em Hêzan pêşkeşnakin; ji ber Em li ser xwe nabînin, van tiştan pêşkeşbikin. Ger ev Cenga hanê ji bona liberxwedana Welêt be, weha ji bo wê me alîkarîya Sultan nevé. Em dikarin Welatê xwe bê alîkarîya Sultan jî biparêzin". Destpêkirina Raperîné bi eskere li Dêrsimê sebeba hatina Hêzên Turkî ji bona navê wê bû, bi armanca nabûdkirina bi carekê ji bona Liberxwedana Xelkê wê bû; ji ber Hêza Bîngehîyî Livandî yên Raperîné ji Cotkarên Dêrsimê dihatin pêkhatin. Ew tev bi carekê çekdarbûn. Weha Pêşahbenderê (Yawerê Konsulê)Ingilîzî Biloti xeber dide, ku tevaya " Eşîrên Dêrsimê, ên ku jimara wana nêzîkî 30000. Nefer tên, bi eskere rabûne ser xwe". Dijî Dêrsimyan Leşkerê Turkîyî Çarem kete Ceng û Şer, her wehajî hin Orduwên Cihî jî tev li wan bûn. Şer li ser Qotên Çiyayên Tuçik û Xot despêkir, ji ber tevaya Xelkên Revçayî ji ber Hêzên Turkî li wir hatibûn komkirin. Şeran sê rojan ajotin. Weha Kurdên Tuçik berê xwe dane Eşîrên Kurdên dorhêla xwe ji bonaalîkarîya wan bête kirin, lêbelê wan Eşîran jî xwe di zîneteke pir tesk de didîtin. Di van bêhnên teng de Ermenîyan ji wan re yarmetî pêşkeşkirin. Weha Hêzên Hevgirtîyî yekkirîyên Kurd û Ermenîyan Turk ber bi Herema Pak duçarî veqerandinî kirin. Yekekî ji Beşdarên Şerê Tuçik dide nivîsandin: " Piştî bi serketinê bi pênc rojan Sipahê Osmanî veqerîya, ê ku careke din ji nuh ve dest bi hêrişê xweyî tûj kir. Turkan Çiyayên serbestkiri bi topan bi rengeki givaştî topbarankirin, lêbelê di nava Liberxwedanan hîç ziyar ne bû.Şer 15. rojan ajot, Herdû Aliyan bi mîrxasî û gernasî şerdikirin. Lêbelê çaxa Turkan dîtin, ku ew bi agir nîkarin zora me bibin, ew bi hemû pêrabûnên pêwistî ji bona me bê av û nan bêhêlin rabûn, da ew me bi" Dîlkinê " neçar bikin. Wehajî vê jî alîkarîya Turkan nekî. Lêbelê piştî cudabûna bîr û baweriyê di nava Liberxwedanan de destpêkir, Yekî ji wan digot: divê em Tuçik berdî û xwe penahî Xotî-Tîrsipî bikin, Yekekî din ji wan digot: ev rêya hanê dê me bi şikenandinê bighîne. Di encamê dawî de Hinek ji Liberxwdanan çûn Xotî - Tîrsipî, piştî wan xeleka dorlêgirtinê şikandin. Weha Dewleta Turkî kêmûna Hêza Dêrsimyan ji xwe re kêskir û ew bi hêrişêke tund rabû, ku wê pê Tuçik da vegirtin. Piştî ketina Kelehê Kurdan dest bi şerên Pêşmergetîyê kirin. Biloti ji Terabzûnê di Çirya Pêşî (Oktoberê) de sala 1878 de ji bona Markîz Solsbêrî dide nivîsandin: "...Bigir berî çar îna Kurdan di bin Rêberîya Hekim ahmed Paşa de hêrişêke şevîyî ji nîşkêve li ser Perçeyekî ji Orduwa Pêşîyî Leşkerê Arzenoaniyî Turkî kir, ê ku ji sê tanî çar Gurdanan pêktê.Ew Gurdanên, ên ku jimara her yekê ji wan bêtir ji 300 Neferî bûn, hatin dîlkin, her wehajî Kurdan sê Topên Çiyayî, jimareke mezin ji Çekan, ji Teqemenîyan û Azoqa Leşker jî ji bona çiyar dane guhestin ". Her wehajî wî jî di pişt re jî da diyarkirin, bê çawa Kurd di nava tiraşên Mêrdîn Bogaz de xwe bîngêhdikin û ewderbasbûna Hêzên Turkî ji bona nava welêt bergîrdikin. Di vê dema hanê de Kurd û Ermenîyan şerê xweyî tûj di çiyayê Xonî-Tîrsipî de dikirin.Vê mîrxasîya qehremanî, a ne pêşbîn, Hêzên Turkî ji bona ber bi pêş ve neçarî rawestabdinê kir. Qemê Monzur bibû sinorê cudabûnê di navbera herdû aliyên Şervan de . Piştî bi serneketinên pir ji pêrabûnên buhurandina çem ji ber şerkirina bêeman ji bal Ermenîyan û Kurdan ve Turk neçarî rawestandina Hêrişê bûn.Weha Hêzên Turkî- ji bil li vir û dera han bi serketina di hin Hereman de - ne dikaribûn desthilatiya xweyî bi carekê li ser Dêrsimê bidin vegirtin. Yekek ji ruçikê Nîşana Raperîna Dêrsimyan Gelêrbûna wê bi xwe bû. Di Şer de tevaya Xelkên Dêrsimê ji Biçûk û Mezinan,ji Zilam û Pirekan tev de têde beşdar bûn.Evsêrên Turkan digotin, ku Pirekan mîna Zilaman bi mîrxasîyeke bê hempa şerdikirin.

Waha ger em vê rastiya hanê li ber çavên xwe deynin, ku cihê Dêrsimî Sitratiçî ew rola bingehîyî pêşî di cengê de li gel Turkan pê daye û xebata Dêrsimî qehremanî her û her guhpêdana tevaya Kurdan di heremên din de ber bi xwe ve dida kişandin, waha Mero dikare bêje, ku vê Raperîna hanê giringbûneke taybetî wergirtibû. Waha Evserê Ingilîziyî di Sipahê Turkî de Milîngin bi eşkere dinivîse: ku " Çiyayên Dêrsimê ji bona Netwê Kurd Keleheke pir asê ye" (191, R . 150).

Waha ev rastiyan hanê jî bi eşkere didin diyarkirin, bê çima Dewleta Turkiyê ew Hêzên Mezin ji bona bi carekê nabûdkirina Raperîna Dêrsimyan raserkirin. Rûdanên Dêrsimê berî û di dema destpêkirina Cenga Turkî- Rusî de di salên 1877-1878 de rûdan. Bi armanca nehiştina belavbûna Raperîna kurdan li Dêrsimê ji bona tevaya Kurdistanê Dewleta Turkiyê hêrişeke Leşkerî dijî Eşîrên Kurdên nezalkirî li kar dirxist. Gorîyên vê hêrişê hanê di bin Rêberîya Waliyê Kurdistanê de Ismaîl Paşê Kurdên Heremên Ikîla, Ixçankend, Botan, Cezîrê û Heremên dinî pir bûn. Lêbelê Encamên van pêrabûnên hanê bi careke ser berjêrî armancên cavdêrbûn. Waha Avriyanov daye nivîsandin: " Gewne û Şexên Eşîrên Botan û Hekarê bes û bi tenha çavdêriya dema kêskirî dikirin, da ew ji bona veqerandina Serxwebûna xweyî berê xwe çengî ser Turkên çapel bikin" (50 , R. 158).

Waha bi nobûna pêwendiyên di navbera Turk - Rusan de hêviya Kurdan bi alîkarîya Rusan ji bona wan bêtir dibû. Her wehaji di wê demê bi xwe de jî Rêberîya Leşkerîyî li pişî Qefqasya bi nêzîkbûna cengê li gel Turkiyê guhpêdaneke mestir bi Xelkên Kurd li Heremên sennor dan. Waha Balyozvanê Rusî li Turkiyê raporekî di 23. Çirya paşî (November) de sala 1876 daye rêkirin, ku tede tê: " Li ser Rêberîya Qefqasya ye, ku ew dildariya Kurdan wergire û ew li gel wan pêwendiyên nehênî bi de kirin, mîna ku di cengên çûyîn de dihate kirin, ger na, dê Dewleta Turkî bikaribe wana ber bi xwe de bide kişandin û li ser tepkên Ingilîzî wan Kurdên Şervan dijî me bi kar binin " (50, R. 86). Bi rastî jî Desthilatiya Turkî li Heremên Kurdistanê ji bona mêldarkirina Serekên Kurdan û xistina wan di Sipahê Turkî de bi hemû kar û barekî rabû. Lê belê encamên wana hiç bi carekê giring nebûn; ji ber Kurdên van Hereman hiç Serbaz ji bona Turkan pêşkeşnekirin û pêrejî jimara Reviyan ji Serbaskirinê berz dibû. Da revî jî Serbazkirinê neyête kirin, Rêberîya Turkî bi jêsitendina hespên Kurdan ji wan û guhestina wana ji bona Peygedariyê biryar da (25. F, 485, D.1234, L.17).

Waha pêrazîbûna Şexê Hekarîyî bi nav û deng Ubeydula bi beşdarbûna xwe ve di cengê de dijî Rusya alîkarîya Turkî bi kişandina Hinek ji Eşîrên Kurdan bi bal wê ve date listin. Lêbelê rûdanên hatin datin xuyanîkirin, ku ew gava kêspereştî, a ku Şex pê rabû, tevî ku wê tanî demekê rabûna Şûreşê li Kurdistanê date bi derengxistin, ne beramberî Rusan gaveke dujminayî bû, her wehaji neji beramberî Dewleta Sulatn gaveke mêldaryê bû.

Waha bi başî Cîgerê Imperetoriya Osmanî Ingilîstan liberket, a ku hemû gavên li hevhati ji bona mayîna aramiyê li Kurdistanê pê rabû. Waha Balyozvanê Ingilîzî pir carî ji Dewleta Turkî bi derkirina Serekên Kurdên Desthilat ji Kurdistanê daxwezkir. Her wehaji di hem demê de jî Ingilîz ji bona rakişandina Serekên Kurdan bi bal xwe ve di rêya nokeryê, diyariyan û sozan de xebat dikir. Her wehaji li gel jî wana bi Ermenîyan û yên din ji gelên File didan yarîkirin û her hêviyeke rizgarkirinê di nava canê wan de wê dida kuştin. Waha Ingilîz ji bona peqandina katbûna kêra Rusya di nava Kurd û Ermen de bi carekê bi her kar û barekî radibû. Waha Ingilîz di ruwê Kurdan de, mîna ku Rojnamevan û Nivîsvanê Ermenî Ravî dide nivîsandin, bergirekî pir xurt dibînin, ku ew dikarin pêşvexistina Rusan di deşta Furat de tanî Hindê bidin rawestandin (300, 1880, jimar 167).

Tev li vêjî dek û dolabên Diplomasîya Ingilîzî berên daxwazkirî bi cihnanîn. Wehaji Desthilatiyên Turkî li gel pêşnihadên Ingilîzî der barê dûrkirina Serekên Kurdan ji Kurdistanê bi bédilî lê temaşedikirin; ji ber ew ditirsiyan, ku ev pêrabûnên sertî hanî aloziyên nuh bidin vexistin, tevî ku hêjî Turkiyê hêviya xwe bi karanina Kurdan ji bona liberxwedana sînorên xweyî Bakurê - Rojhilat û Rojhilat nebirîbû.

Weha Kurdan di dema bûyînên Şeran de pir barên giran çî ji aliyeş (ser bi ser yanî bi pûl) ji bona pêşkeşkirina Azoqeyî pêwîst ji bo Hêzên Turkî hilgirtin. Ji van baran tevan jî sengîntir belavkirina Serbazên Turkan li ser Malên Kurdan û mayîna wan li wir bû. Lêbelê di pêrabûnên cengî de pir kêş ji Kurdan têde beşdarbûn. Ji roja pêşî ji Cengê Kurd li ber Serekên xwe rabûn û bi destpêketina bêhna kêsa pêşî ew li gel çek û teqemeniyên xwe ji qada Şer derketin.

Weha bi lez û bez Kurd ji Sipah bi Liqan bi carekê direviyan. Musa ji bona nimûne di 17. Yunyo de sala 1877 de 1500 Mirov ji bajarê Beyazîdê çûn û di rêde 1000. Suwarên din ji Kurdan Ji Leşkerekî din tev li wan bûn. Weha di dema dorgirtina Keleha Beyazîdê de bes û bi tenha li nik Ubeydula ji 5000. Kurd 1443 Kes man. Vê rastiya hanê Ubeydula bi devjêberdana dorgirtina Kelehê û veqerandina wîna ji bona Bargêrê neçarkir.

Her wehaji pir caran jî Şerkin li teniştê Turkan Kurdan xwe ji ber didan alî. Pêrejî pir caran wana ji Rusan daxwazdikin, ku ew di nava Sipahê wan de bêtin wergirtin.

Biserketinên Rusan li nêzika Qars, li Beyazîd, li Saxanloxa û li Xinis-Kal kêreke pir giran li ser rewşa Kurdsitanî Siyasî kirin. Weha Şahbenderê (Konsol) berê li Erzeromê Ivanov xweser piştî ketina qarsê daye nivîsandin: " Ez bawerim, ku Kurdistan bi kûrbûn neha di Şûreşê de û ji bona li karxistina wêna pir remanê dike". Weha lihevhatina girêdayî di navbera Turkîyê û Rusya de di 31. Rêbenda (Dêsember) sala 1877 de pêşketina biserketî a Hêzên Rusî di qûlbûna Heremên Rojhilat de ji Imperetotiya Osmanî, her wehaji li gel jî li Kurdistanê jî hate rawestandî; ji ber li wê derê di rastiya rastî de Hêzên Rusî liberxwedaneke weha nedît; ji ber Xelkên Cih li herifandina sitembariya Turkên çil û çepel hêvîdarbûn.

TEVGËRA KURDAN DI BÎN RÊBERIYA UBËYDULA DE

Cenga Turkî - Rusî tengaya abûrî û siyasî di Imperetoriya Osmanî de da kûrkin. Nemaze Şerên Leşkerî di anîya Rojhilat de bi rengekî pir nebaşî giran li ser rewşa abûrî di heremên Rojhilatî welêt de, cihê ku Kurd û Ermen lê diyan, hatin mirêkkirin.

Bê dildariya Gundiyan, ên ku dikarîbûn karbikin, ew ji bona sipah hatin kişandin. Her wehaji talankirina gundan ji bal Hêzên Rêxistî û bêtinkirina bacan ji bona dagirtina xizna Dewleteyî valayî pir Gundî dilê wan man.

Li gel komkirina bacan zordarî û sitemkariya Karmendên Turkan û Zemîndarên Kurdan dihatin tengalkirin. Di gava bac nehatana dayîn, Dewletê ji bona Komkirina wan bi darê zorê Hêz didan rêkirin. Pir caran Desthilatiyên Dewletê ji Xelkê dan ji ber sala dahatî daxwazdikin.

Di pir Heremên kurdî de Zemîndarên cihî li gora kêfa xwe mezinbûna bacan didan nîşankirin. Vê nîşankirin û komkirina bacan a pir bi darê zorê dilê Gundiyan date hiştin.

Weha birçîbûna salên 1878 - 1880 tevaya abûriya Heremên Kurdî bi carekê ji hêz xistin. Bi vî rengî Rojnamevanê Taymêz di 5. Avdara sala 1880 de dayite nivîsandin: " Destana li Diyarbekir û Musilê pir gewre ye û tevaya Xelkê bi carekê ji destikên jiyanê bêbeşî". Weha bes û bi tenha li Hekarê 10. hezar Mirov ji birçîbûna mirin. Her wehaji rojname "Mişak" daye nivîsandin: " Birçîbûn her û her bêtin dibe, Xelk li her cihî bêhêz dibin, weha ji Birçîbûn û nexweşiyê ew ji bona kelexên hestiyî berdayî li ser kolanan têtin guhertin, her û her ew axîn û nalîn dikin û xerxwaziyekê daxwaz dikin. Bi Birçîbûnê pir Mirov mirin. Birçîbûnê abûriya guhestî û a niv guhestî li nik Kurdan tengalkir.

Bi Hezaran di rewşeke bê hêvî de dijîn, ji ber vê jî berê xwe ber bi Bakur ve, ber bi sînorê Rusî de vekidin, bi hêviya penayekê yaxud letekî nan li Rusya werbigrin. Bînvanan daye nivîsandin, ku hemû rê û rûbar li dorhêla Çiyayê Araratê bi Hejar û Birçiyên Kurdan hatine dagirtin, pir ji wan li ser rêyan ji Birçibûnê mirin.

Her wehaji Birçibûnê di salên 1877 - 1878 de Heremên Kurdîstana Iranê jî da ber xwe. Li ser encamê zuhabûna salê û di pişt re jî li ser lehîyên pir rabûyî Birçibûneke pir gewre û bela bi ser Serên Xelkê de hat. Li gora peyvên Bînvanan rewşa Xelkên Kurdîstana Iranê hîç li gel rewşa Xelkên Heremên Rojhilat ji Imperatoriya Osmanî ne dihatin cudakirin. Weha " Mişak " dide nivîsandin: " Wisa Birçibûnê ji Xelkê li hin cihan aqil û seuda berda, ku wan nema guh bi yasa, yanî bi qanûnan û yaxud bi Pasewaniyê didan, wana kom bi kom hêrişî ser Enbaran dikirin û genim ji wan didizin.

Ev destana gewre, a ku bi serê Milet de hatibû, ji bona Raperîneke Kurdîyî nuh palpêdanek bû. Weha Serkirdayetîya vê Raperîna hanê Şêx Ubeydulayê Nehrî Serekê Derwêşê Neqşebendî kir, ê ku kêra wîna bi diyarî her û her di nava Kurdan de di salên Heftêyî de berzîr dibû.

Piştî Cenga Turkî - Rusî a salên 1877 - 1878 Şêx bi êşkera ji bona Serhildanê xwe li kar dixist. Her wehaji pêrejî Ereben Wilayeta Bexdadê amadebûna tevlêbûna xwe li gel Serhiladnê dane derxistin, ger Kurd Musilê vegirin. Bernameya Ubeydula bi lezbûna belavbûna Serhildanê bi armanca rizgarkirina tevaya rexê rojhilat ji Imperatoriya Osmanî ji nav pencên Dewleta Sultan pêwîstdikir. Weha li ser hêza Şûreşgêrên çekdar ji Eşîrên Mengur û Memeş li Iranê di bin Rêberîya lawê Şêx de vegirtina Rewandûz û di pişt re vegirtina Bexdadê hatibû danin, her wehaji li ser Beşekî ji hêzên din di bin Rêberîya Kurê Biçûk de Abdolqadir vegirtina Emadiyê û Musilê hatibû danin û li gel Hêzên mayî de Ubeydula bi xwe bajarê Wanê bide vegirtin.

Dewleta Sultan, a ku bi likarxistina Serhildanê agehdar bû, hin gav ji bona bergirtina nerabûna wêna avêtin. Weha di payîza sala 1879 de Marşal Semih Paşa nala Ser Leşkerê Enedolêyî Çarem hate nişankirin û ew bi pir Desthilatiyan hate rêkirin. Berî ku ew têkeve pêrabûnên ser, wî Hêzên ji Erzeromê, Înzican, Musilê, Diyarbekir, Wan û ji cihên din li dora Hekarê civandin, wî rêyên di navbera Hekarê û Heremên Kurdîyî dinî dorhêla wê de date birin, da ku Xelkên wan cihan nikaribin tev li Şêxê Şûreşgêr bibin.

Ji ber rewşa nuh hatî û nêzîkbûna Zivistanê Şêx Ubeydula bi destpêkirina Serhildanê neda lez kirin. Bi destpêkirina sersala 1880 wîna Wênerên xwe ji bona hemû Serekên Kurdan re dane rêkirin û ji bona Raperîna giştî dijî Koledarên Turk û farisan wî ji bona wan bankir.

Li gora raportê Şahbenderê Ingilîziyî Giştî li Erzeromê Apot ku her roj ji 500 tanî 1000 Mirovî ji bona nik Ubeydula dihatin. Apot di mêjûwa 8. Axlêvê (Yungo) sala 1880 de dide nivîsandin: " Ji bona wan tevan, ên ku di nava Kesên mîrîyî Farisî û Turkî de tîr dîtin, Ubeydula dijbûna bi carekê ye". Şêx bi xwe yan jî yekî ji zarokên wîna li Serdanên xwe pêşewazîdikirin.

Vê Serhildana likarxistî ji bona vexistinê li ser sînorên Imperatoriya Osmanî û Iranê sergêjî ji bona Ingilîsatnê peyda kir. Weha Ingilîzan yek ji baştirîn gav dijî Kurdan parastina sînorên Turkî - Iranî û nehiştina derbasbûna Kurdan di nava wan re. Ji bona vê mebestê jî Balyozvanên Ingilîzî li Istenbol û Tehranê li gel Sulatan û Şah dest bi gif û bêjêkirin, her wehaji li ser pêrabûnên Leşkerîyî li gel yê dijî Kurdên ser sînor dane axivtin.

Di dawîya Gelawêja sala 1880 de li Şemdînan nala Kongireyekî Serokên Kurdan hate girtin. Ew Kongirê hanê di mêjûwa Kurdan de firehtirîn Kongire bû. Wêner ji Sulêmanyê, Amedê, Hewremanê, Botan, Çiyayê Sasûnê, Sêrtê, Mûşê, Wanê û ji Kurdîstana Iranê ji bona Kongire hatin. Her wehaji Serokên Heremên dûr mîna Sîwasê û Amasya jî ji bona Kongire hatin. Ubeydula armanca bingehî ji bona girtina Kongire di Hevalbendîtiya Eşîrên Kurdî û amadekirina Şûreşê de didît. Kongire di zîneteke bahoz de di hate girtin û têde pir bîr û bawerîyên tûj û cuda dihatin derketin. Hin ji Serokên xwe firoşên ji bo Desthilatiyên Turkan di pêşîya pêşî de pirsîyarîya Hevalbedîtiya Eşîrên Kurdî dijî Ermenîyan û feleyên din dane pêşkeş kirin.

Ubeydula bi xurtî beramberî van bîr û baweriyên hanê rawestiya û bi diyarî armançên wanî kûjî ji bona kurdan di ayinde de date eşkerekirin. Wî da xuyanîkirin, "Ger tanî neha Turkî piştî kurdan digirt, ev jî bes û bi tenha bi armanca danîna Kurdan beramberî Filan li Enedolê bû, lêbelê ger Ermenî li wê derê bêtin nabûdkirin, dê giringbûna Kurdan bi xwe di çavên Dewleta Turkî de bête şikenandin". Li gel vê jî wî hêjî pêvekir, karekî wûsa dê Dewletên Ewropî dijî kurdan bidin rakirin. Wehaji pêrejî Ubeydula li ser pêwistiya pêkanîna Kurdistaneke serbixwe axivî: "Bese bînferehbûn û mana me nala Neşîvnanan ji bona Olnenasên Turkan bimînin. Divê em bîn rizgarkirin". Wîna Dewleta Îranê jî li teniştî Sultan di nava jimara Dujmînen kurdan de danî: "Herdû Dewletên hanê li ber pêşketina me radiwestin û berdigrin".

Di çaxa girtina kongire de li ser bin gehê cudabûnan di nava Serokên Kurdan de û her wehaji neviya hinan ji wanên rawestandî dijî Sultan Ubeydula biryarîya dawî ji bona guhertina pilana Raperîne da. Weha pilana nuh li ser bingehên rastiyên li warê hate danîn û Şêx ew di civîna giringî de li Nehrê date pêşkeşkirin.

Ubeydula armanca nêzikî nehayî Raperîne rizgarkirina kurdistana Îranê danî; ji ber Dewleta Îranê bigir tevaya Hêzên xwe ji bona Berîya Turkumanya rêkir, da ew Raperîna Turkumanya nabûd bike. Wîna di vî babetê hanê de got: "ger jî guhpêdana Fursan nebaramberî Turkumanan ba jî, divê em ji wan netirsîn; ji ber bi zor dê Îran bikaribe 100. hezar Serbaz bi de komkirin, ku nivên wan ji Zaruwên meyî Kurdane, ên ku Dewleta Îranê weha sitembariyê li wan dike, ku ew ji hêza hilgirtina mirovan tete der".

weha li ser deştên Kurdistana Îranê û perçeyekî ji Ezerbêcanê ên dewlemend li gora pilana Şêx divê bi bengehekî serekiyî abûnî ji bona Raperîne bibin. Wî got "Ji ber Perçeyekî Kurdistan bi Îranê ve hatiye girêdan, bi şerê li gel aliyê qelstir dê emê birayên xwe rizgarbikin û dê emê Xwedanê wî welatê dewlemendî merd mîna Ezerbêcan bibin, dê emê xwedanê kanîyekê, ku ew nayête miçiqandin, ji bona cengê dijî Dujmîne xweyî din Osmaniyan bibin.

Weha bi danîna Ubeydula ji bona vê Pilana hanê Pêwendiyên ne liserhev di navbera Imperatoriya Osmanî û Îranê de di dema û di piştî Cenga Rusî-Turkî de û bi taybetî pevçûnên wanî her demî li ser sînor date wergirtin. Îranê li Kongirê Berlîne ji Turkiyê daxwaza Herema Kuturayî giringî Sitratîcî dabûkirin. Şêx li berket, ku dê Imperatoriya Osmanî di dema Raperîna Kurdan de hiç rê li ber wan ne de girtin, gava ew di sînorê Îranê re bêtin buhurandin. Nav û dengê Şêx di nava Kurdên Îranê de, ên ku piraniya wan ji Musulmanên Sune bûn, pir xurt bû.

Xweser piştî bi dawî hatina civîne dest bi jêhatbûn li karxistina Raperîne hate kirin. û ji bona Girawkirina Çek Xelkên Nas ji bona Navwendiyên giring hatin rêkirin. Seyid Abdul-Rehman ji bona Hoyê, Seyid Sadiq ji bona Selmasê, Şêx Bedîn ji bona Ormiyê hatin rêkirin. Bi jêhatbûneke pir diyar li Kurdistana Îranê Hemze Axa, Serokê Eşîra menguran pêrabû. weha Şahbenderê Rusîyî Giştî li Tebrîzê daye nivîsandin, ku Kurdên li Îranê "ên ku Perîşanyê û Serpereştiya Îranî ew dane daxdan, gijin û hesteyên wan beramber bi Îranê tev de dijin". Şahbender weha pêşbînî dikir, ku ewana dê Şêx hembêzbikin" mîna dilsozekî dê lê ew temaşa bikin û dê tevde bi carekê bi aliyê wî ve bêtin guhestin".

Jêhatbûna Hemze Axa ji bona li karxistina Raperîne ne razîbûna serdarê Sablax, Lutif Alî Mîraza date derxistin. Pevçûna di nava wan de bû hoyê destpêkirina Raperîna Eşîra Mengur. Hemze Axa, Rêberê Raperîne berê xwe da Şêx Ubeydula ji bona yarmetiyê jê wergire.

Ubeydula dest bi pêrabûnên cengê di Kewçêrnîkê (Septembar) de sala 1880 de kir. Piştî Raperîna Mengur li Îranê hate veketin, li gora pilana danîniyî berê divabû li ser Raperîne bi sé Semtan ve bête berz kirin: Li ser hêza kurdîyî yekem di bin Rêberîya Abdul-Qadir û Hemze Axa de girtina Sablax û di piştî re Tebrîz hatibû danîn, li ser Hêza duwem, a ku li xakê Îranê li Mergever di bin Rêberîya Muhemed sadiq hatibû pêkhatin, divabû jêhatbûna hêza yekem hisan bike û bajarê giringî li ser sînor Ormiyê bide vegirtin û Hêza Sêyem di bin Rêberîya Muhemed Seîd divabû li Biradost bête pêkhatin, erkê bingehîyî vê Hêza hanê bû, ku ew

Li gel Hêza duwem tevaya Heremên Rojavayî Ormiyê her wehajî li gel jî Bajrê Ormiyê, Selmasê û Hoyê bindesbikin. Rêberîya Giştîyî van herdû Hêzan di Destên Şêx Ubeydula de bûn.

Di roja duwem de Pelên Hemze Axa û ên Abdul-Qadir ji bona herema Mergever gihaştin, bêtir ku ew ji bal Hêzên Sînorîyî Iranî bêtir beramberkin. Li wê derê serokê Kurdên cih Mahmud Axa li gel 500.-600. kurdan tev li wan bû. Her wehajî Xelkên Herema Şîno, ên ku ji bal Desthilatîyên Iranî pir azar dixwarin, bi 400. Mirovan çek hilgirtin û ew jî tev li Raperîna bûn.

Di 10. Kewçêrînkê (september) sala 1880 de Şûreşgêran Herema Mengur xistin destên xwe, her wehajî li wê dere Pelekî Siwaran bi jimareke bêtir ji Hezar Kesî tev li wan bûn. Di 15. Kewçêrînkê (september) de Şûreş kete Herema Lacan, aku têde Eşîra Pîran dijî, " a ku dilsoztirîn Eşîre di nava Eşîrên Kurdan de ji bona bîr û bawerîya yekîtîya Kurdan têde dîtin". Vê Eşîra hanê 2000. Pêya û 1000. Siwar ji bona Raperîna pêşkeşkir.

Bi lez û bez Raperîna tevaya Heremên Kurd li Iranê vegirt. Raperîvanan Pelên çekdar bi rêdixistin ji bona ew tev li Hêzên Ebdul-Qadir yaxud tev li Hêzên Ubeydula di gihiştinan de bibin. Hêzên sînorî Farisîyî kêr bê liberxwedan ber û paş ve texbûn.

Di nivî Kewçêrînkê (september) de Kurdan tevaya Heremên Lacan û Serdeştê xistin nava destên xwe. Weha Şûreşgêrên Kurd, ên ku li ser kîsên Xelkên Raperîna roj bi roj Hêza wan gewretin dibû, metirsîyeke rast û durûst ji bona Dewleta Iranê li dar dixistin. We Bînvaneke Farisî dide nivîsandin: " Weha ne bes tenê dijî Iranê 20000. Kurd raperîna, lêbelê tevaya Xelkên Kurdistanê bi carekê dijî Iranê li ser lingên xwe rabûne.

Şûreşgêran xwe bi lez bi gewretin bajarê Kurdistanê Sablax (Mehabad) ve gihandin. Weha gava Lutuf Alî Mîrza dît, ku Xelkên Bajrê bi carekê piştî Şûreşgêran digrin, wê çaxê ew li gel Şûreşgêran kete gift û bêje. Şûreşgêran rê pêdan, ku ew li gel zar û Zîçên xwe û bi Peyên xwe ve piştî hiştina çek û malên xwe ji bajarê bide barkirin. Di piştî re bêtir berdana guleyekî bi tenha xwe Kurd ketin bajarê.

Veşartina biserketîna gewreyî Raperîvanan dihate dîtin, mîna ku Peyamêrê " Taymîz" daye nivîsandin, ku Xelkên Welêt ji Kurdan, ên ku ji bal Dewletê bi sitemkarîyê dihatin sitirandin, Ubeydula nala Rizgarvanekî Dilsoz pêşewazî lêdikin. Di çaxa Şeran de li gel Pelên sînorê Iranê di piraniya caran de Evser û Serbazên Kurdan, ên ku di Sipahê Iranî de serbazîdikin, xwe ji bona alîyê Kurdan ve dane guhestin.

Piştî liberxwedaneke sivik Kurdan Bajarên Minduab, Milikyan, Maraxa girtin û bi serketî ber bi Tebrîzê ve çûn. Derketina Kurdan ji nişkêve li nêzîka Tebrîzê tirs û aloziyeke mezin xiste nava Bajrê. Xelkên Bajrê dest bi çekkirina xwe kirin û berband danîn.

Şêx Ebdul-Qadir di dema pêşketina Leşkerê Raperîna de ji bona girawkirin û parastina jîna Xelkên Sipartî û malên wana bi hemû gavên pêwîst ew rabû. Her wehajî pêrejî bi teybetî Neşîvanên Rusî hatin parastin.

û ji bona Serpereştîkirinê û parastina Şîrazê yasa li Heremên vegirtî Ebdul-Qadir Serdar ji Hozanan dan nîşankirin û piştî vegirtina Sablax (Mehabad) Dewleteke Demî ji bona Kurdistanê hate pêkhatin. Weha ev karê hanê hewildanek bû ji bona danîna Dewletên din li ber karê li rastê. Lêbelê Dewleta Kurdî pir bi bê sînor qels bû û derketina wêna derketineke buhurandî bû.

Lêbelê rewş li Herema Ormiyê bi carekê cudabû, li wir Ubeydula bi xwe Rêberîya Pelên Şûreşgêran dikir. Li wir Desthilatîyên Iranî bi alîkarîya Hengecîyên (Regiment) leşkerîyên cih dikarîbûn liberxwedaneke bi kêr ji bona Ormiyê bidin bi rêxistin. Ji ber girîngbûna gewrebûna cihê sitratîcîyî Bajrê Ubeydula bi her giraniyekê wî ji bona wergirtina wê kar dikir. Di vê pêla noyî rabûyî de di Rojavayî Welêt de Dewleta Iranê pêrabûnên pêwîst ji bona nabûdkirina Bizava Kurdî wergirt. Weha bi fermana xweser ji Şah Komek ji Hêzên Iranî di bin Rêberîya Ismet Al-Sultan ji Tebrîzê derket û Koma Duwem di bin Sermiyardarîya Evserên Siwêsrî de di bin Rêberîya Hemze Mîrza Hemşe Al-Dilobî li gel Evserên

Ewropî ji Tehranê ji bona Hemedan û Kermensah dertin. Koma Sêyem di bin Rêberîya Teymur Paşa ji bajarê Hoyê derket. Komê Leşkerîyî din ji Hemedan Erdebilê hate pêkhatin.

Di dema ku Îranê xwe ji bona lêdana Serhilana Kurdan li kar dixist, Hêzên Kurdiyên Şûreşgêr hêrişên xwe li ser Tebrîzê kêm dikirin û ew bi talanîya Heremên Ezerbêcanî dewlemend ketibûn. Pir ji Kurdan, ên ku ji rewa ber Birçîbûnê xwe bi Raperînêve gihandibûn, piştî ku wan têra xwe talanî kirin, dev ji Serbazxanên Şûreşgêran berdan û ji bona nava malên xwe ew veşeriyên.

Wêha Şahê Îranê reuş û zînetê kar û baran li Kurdistan tanî wî sînorî bi tirs dî, ku wî li gel li karxistina Hêzên Farisî ji bona Hêrişê, pêrejî wî berê xwe da Rusya û Ingilistanê û wî ji wan daxwaz kir, ku ew Dewleta Turkî ji bona wergirtina pêrabûnên nabûdkirina Kurdan ji paş ve razî bikin.

Dewleta Şahî Hêzên Suwarî xweyî Hilanîyî taybetî, ên ku bes di dema cengê de dihatin bang kirin, jî bona vê mebesta hanê jî ew daxistin. Nêzîka 20000. Suwar ji Kiradaxiyên û Şahîniyan hatin civandin û çakkirin. Van Suwarên hanê roleke pir mezin di nabûdkirina Raperîna kurdî de lîstin. Wana bi karên xweyî dir û hov tirs û lertz di nava tevya Xelkên Kurdistanê de dane belav kirin. û ji bona lêdana Raperîna Kurdan Dewleta Şah Xanê Makiyan Teymur Paşa da nîşankirin. Hatina Teymur Xanî bi lez ber bi Ormiyê de nehişt bajarê dorgirtî ji bal Kurdan ve bête berdest kirin. Ubeydula Muhemed sadiq bi Leşkerekî ji 2000 Şervan dijî Teymur Paşa rêkir. Lêbelê Teymur Paşa dikarî bû xwe ji Cewşenê (ji şer) dûr bike û xwe li aliyê din nêzîkî bajarê bike. Wî Kurd di lihev xistina nêzîkî Pilawê de dane bezandin, di pişt re jî Şêx xwe ber bi Cînis-Kal ve date kişandin. Lêbelê Teymur paşa bi dû wî ket û di rêya xwe de wî Xelkên bê gunehî li dora Ormiyî dane talan kirin.

Wêha reuşê nebar ji bona Kurdên, ên ku berên xwe ber bi Sablax (Mehebad) û Tebrîzê dane, hate pêkhatin. Wêha ji Xiyaneta Serokên Kurdan, ên ku Raperîna dane firotin û her wehaji kêm bûna Hêzên Asêvanan di encamê derçûna Beşekî ji Kurdan ji nava wan, Ubeydula û Hemze Axa bi veşerandina ber û paş ve neçar bûn. Di vê çaxa han de Hêzên Îranî, ên ku di Erdên Kurdan de liberxwedaneke nuh liber xwe nedidîtin, bi lez ew dihatin bi pêşveketin.

Hêzên Îranî di rêya xwe de gundên Kurdan didan sotandin û talan kirin, Biçûk û Mezinên Kurdan bê cudabûn didane kuştin, ji vê kuştina hanê ne Temen û ne jî ne Beşdarbûna Raperînê dida kêr kirin. Parêzgerê Miyandun Excete Mîrza Ebdul-Qasim Sundxwar, ku ew dê serê her Kurdekî têkeve nava destên wî bide birandin. Ji bona Hoybûn û dirbûna Parêzger ji bal Desthilatên Tebrîzê navtêdan jêre di hate dayîn.

Li gora Nûçeyên Rojnameya Turkîyî " Dem " Dewleta Îranê date zanîn, ku her yekî Serê Kurdekî bine, dê ew 4. Lîran xwe ji re bide wergirtin. Hêzên Îranî bi dirbûn û bê dilovanî Xelkên Kurd dane kuştin, xwîn li Heremên Kurdî dane rijandin û ewana ber bi Sablaxê (Mehebadê) ve hatin.

Di 8. Çirya Paşî de Hêzên Tehran li gel Hêzên Bînabe di bin Rêberîya Itîmad Al-Sultanî li nêzîkî Sablaxê (Mehebadê) bi hevguhîştin û di pişt re ew bi du Biran ji hev cudabûn. Yek ji wan Biran li Sablaxê (Mehebadê) ma û Bîra din ber bi Ormiyê ve xwe da kişandin. Bi nêzîkbûna Hêzên Îranî ber bi sablaxê (Mehebadê) ve Xelkên wêyî Kurd, ên ku bi carekê pişt Raperînê digirtin, bi serê çiya ve derketin.

Abdul-Qadir, Hemze Axa û ên din ji Serokên Kurdan xwe ber bi Herema Mergerver ve dane veşerandin. 4. Leşkerên Peyade û 1500. Suwar li gel 4. Topan dane dû wan. Di bin givaştina Hêzên farisî de Serpêçîvanên (Asêvanên) kurdan di çerîya paşî (Novemberê) dedi sînorê Imperetoriya Osmanî de buhurin. Îranê ji Dewleta Sultan daxwaz kir, ku ew Serokên Kurdan bigre û ew wan berdestên Îranê bike. Ev daxwaza hanê ji bal Ingilistanê û Siwêdê lê hate pişt girtin.

Weha ji Balozvanî Ingilîzî li Istenbolê Goşîn li ser Dewleta Turkî date merckirin, ku " ew divê Ubeydula bide sizakirin yanjî wî berdestê Iranê bide kirin".

Piştî çend ji Bibîrxistinên li dûhev ji Aliyên Dewletên Navcînkirinê Hêzên Sultan bi çend gavan ji bona girtina Ubeydula Rabûn, nemaze piştî ku ji wan re bi êskere hate diyarkirin, ku Şêx xwe ji remana ji nuh ve vêxistina Raperîne nade dîrkirin, her wehaji ew ji bona vê mebesta hanê ji Çek û pêwistiyên Leşkerî jî dide kirin.

Weha ji bona Ubeydula bi zimanekî pir zinhari hate pêşkeşkirin, ku ew divê li gel Wênerên Dewleta Turkî ji bona gift û baje bide pêwendîkirin. Bi vî rengî Sulêman Paşa bi jîrbûna xwe ve Şêx di bin çavdêriyekê de ber bi Istenbolê ve bir û weha ew li wê derê nala Dîlê Rêzlêgirtî jiya.

Weha bi vî rengî ev Raperîna Kurdîyî mezin hate dawîkirin. Lêbelê Hemze Axa, Serokê Eşîra Mengor bi dirêjî beramberî Desthilatîyên Iranî date şerkirin. Hêjî bi serdejî di dawîya sala 1880 de Eşîra Hemawend li nêzikî Kermanşa li ber Dewletê rabû ser xwe, her wehaji di sala 1881 Eşîra Şikakîyî mezin û Eşîrên din jî beramber bi Iranê dest bi Raperîne kirin, lêbelê Desthilatîyên Iranî bi lez dikaribûn van Raperînen hanê nabûd bikin.

(Ji Destnivîsa Erebi, a ji bal M. Mizgîn hatiye wergerandin, ev wergerandina Kurdî jê hatiye kirin).